

## Sinetkirina jinan û pergala zilaman

Li gor tibê pênasekirina sinetê jêkirina çermê serê penîsê ye. Lê belê di nav pênaseyên ku min xwendine de rastî sineta jinan nehatime. Heta min weke 'sinetkirina jinan' bi nav nekira û lê negeriyama tu tişt peyda nedibû, lê dema... ***Şîndar Akinci / R.2***



## Teorî û rexneya wêjeyê

Di rojeva wêjeya kurdî de nîqaşên têkildarî teorî û têgehên wêjeyî gelek caran bi helwestên reaksiyonî çêdibin. Heta hin caran ev helwesta neyînî bi şêweyekî wisa tê bilêvkirin ku gumanbariyeke aşkera der heqê pêwîstî û... ***Samî Hêzil / R.5***



## 'Rêwitiya ji bo jiyanê'

Li cîhanê, mirovan li şeş deveran bi awayekî paralel, di heman demî de û bêyî haya wan ji hevûdu hebe dest bi jiyana niştecihî kirine û li ser van deveran şaristanî pêş ketiye. Meksîka û Mezopotamya, ango welatê zapatîsta... ***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***



# xwebûn

4-10 COTMEH 2021 HEJMAR: 94 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org



# Dema dîplomasiya kurdan e

Karê ewil yê hemû hêzên ku dixwazin li Rojhilata Navîn aramî, aştî û nirxên gerdûnî bi cih bikin ew e ku divê ji bo bidestxistina mafê winda yê 100 salên dawî yê dîroka kurdan rêzê bigirin. Doç. Dr. Ahmet Yildirim diyar kir ku ji bo gelên bindest yên bêdewlet du rêyên meşandina dîplomasiyê hene û got: "Divê hûn mafdarbûna xwe baş bihûnin... ***Hevpeyvîn / Bahadîn Akhan / R.4***





## Erdogan û Pûtîn bêyî hev nikarin bikin

29'ê meha îlonê roja çarşemê Serokê Rûsyayê Vladimîr Pûtîn û Serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayyip Erdogan li bajarê Soçiyê li hev civiyan. Piştî serdana Erdogan ya Amerîkayê ev hevdîtin û çawaniya hevdîtinê ji aliyê gelek kesan ve dihat meraqkirin. Hevdîtinê nêzî 3 saetan dewam kir. Di vê hevdîtinê de mijarên hatin destgirtin, nêzîkatiya aliyan ji hevdîtinê re û piştî civînê nedayina daxuyaniya çapemeniyê ji gelek aliyan ve tê nirxandin. Divê em bizanibin ku li herêmê pêdiviya Rûsya û Tirkiyeyê bi hev heye. Her çendî di navbera wan de hin nakokî hebin jî ev nayê wateya ku wê ev nakokî li ser têkiliyên wan ên stratejîk bandoreke neyînî çêbike... ***Felemez Ulug / R.7***

# Psîkolojîyê rayedaran xeripîya



Tarîx destpêkê aşma Teşrîna Verêne nawit. Serewedaritişê 6-8ê Teşrîna Verêne ya 2014î heme xeyalanê xelîfatîye ê çeteyanê DAIŞÎ û Serokkomarê tirkî Tayyîp Erdoganî sero bin kerd. Çeteyanê DAIŞÎ serra 2014î de Şengalî ra dima, seba qirkerdişî verê xo dayî bajarê Kobanê û dest bi hêrişan kerdî. Xêncê taxêka qicek, pêroyê Kobanê binê îşgalê çeteyanê DAIŞÎ de bî. Dewleta tirke hêvî kerde ke aye taxe de zî û... ***Helîn Uzel / R.9***

## Destgirtiya bira

Xweziya min bi wan çaxan, çiqas rojên xweş bûn. Ez hê jî li pey wan rojan digerim di nava jiyana xwe de. Di nav malên cînarên me de tenê em du heb qîz diçûn dibistanê, navê me her duyan jî yek bû, ew ji eşîreke din bû, ez jî eşîreke din. Xwarin û vexwarinên me hertim bi hev re bûn, ew ji min bilindtir û bedewtir bû.... ***Kewê Redkan /R.10***

## Li Hewlêrê 'Konferansa Aştî û Vegerandinê'

Gelê kurd li başûrê Kurdistanê salvegera birîna xwe derman dike. Birîn birîna raferandûma 25 Îlona 2017'an e ku di encamê de başûrê Kurdistanê nêzî ji sedî 51'ê erdnîgariya xwe winda kir û rûpeleke nû bi Bexdayê re vekir. Her wiha der barê hilbijartinên ku tên payîn di 10'ê cotmeha bê de bêne lidarxistin, kanaleke Israîlê di vê dema hesas de encamnameya konferansa 'Vegerandin û Aştî'yê weşand û tê de hate gotin ku 'iraqî dixwazin têkiliyên xwe bi Israîlê re normalîze bikin.' Navenda Pêwendiyên Aştiyê ku li New Yorkê ye konferansek di bin navê 'Konferansa Aştî û Vegerandinê' de di 24'ê vê îlonê de li... ***Serdem Silo / R.6***



## Her wêneyek dibe qêrîn û hewar

Bi pêşketina teknolojiye re êdî bûyerên ku çêdibin bi rengên cudatir û leztir belav dibin. Carna nûçeyeke ku bi rûpelekê tê ragihandin bi wêneyekî jî tê aşkerakirin. Wêneyên Ribwar Parwîzî jî li ser vê tarzê ne ku nûçeyan bi wêneyan radigihîne. Ribwar Parwîzî di sala 1984'an de li gundê Elekê yê bajarê Kamyaran ê rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye. Parwîzî ji ber zextên rejîma Îranê neçar ma derkeve ***Medya Bal / R.11***



## Kevir û Ziber

Dîroka zêr û ziber ango kevirên xilxalan heta 7 hezar salan di nava dîrokê de şax berdide. Di vekolînên şûnwarnasiyê de li ser laşê mirovan zîv, zêr û zibêrê xemlê ku aydî 7 hezar sal berê... ***Elo Dîno / R.12***

## Her malbatek xwedî înîsiyatîf e

Li gorî daneyên Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) 605 girtiyên bi nexweşiya giran, bi giştî hezar û 604 girtiyên nexweş hene. Bi sedan girtiyên nexweş divê bêne berdan, lê nayên berdan. Dîsa gelek girtî li gel cezayên wan qediya ye ne jî nayên berdan. Rêveberê MED TUHAD-FED'ê Ahmet Baran, li ser rewşa girtiyên nexweş, tecrîdkirina girtiyan û pergala înfazê axivî. Baran, bi bîr xist ku ji bo balê bikişînin ser rewşa girtiyên nexweş dê di 2'ê cotmehê de panelekê li dar bixin û wiha got: "Em ê di 2'ê cotmehê de li Otela Mîtanî panelê li dar bixin. Em ê bi tevlibûna nûnerên hemû saziyên civakî û parazvanên mafên mirovan vê panelê pêk bînin. Dîroka wê hatiye diyarkirin. Wekîl û qada siyasî jî dê beşdar bibin. Em ê li ser mijarê... ***R.3***

# Sinetkirina jinan nerîteke pergala baviksalariyê ye



Şindar Akinci




Li gor tibê pênasekirina sinetê jêkirina çermê serê penîsê ye. Lê belê di nav pênaseyên ku min xwendine de rastî sineta jinan nehatime. Heta min weke 'sinetkirina jinan' bi nav nekira û lê negeriyama tu tişt peyda nedibû, lê dema min wisa bi nav kir û ez lê geriyam agahiyên li ser sinetkirina jinan peyda bûn. Yanî cîhan, tib û dîn gava behsa sinetkirinê dike behsa jin, mêr û zayendên din nake; ji ber ku tu fêdeya wê ji bo tibê yanî ji bo tenduristiyê tune ye û di tu baweriyê û kitêbên pîroz de pênase yan pesîndayîna sineta jinan cih nagire.

Lêkolînên UNICEF'ê ( Fona Zarokan a Neteweyên Yekbûyî) yên sala 2016'an dibêje: "Li ser rûyê cîhanê 200 milyon jinên sinetkirî hene. Ji van; 27 welatên Afrîkayê ne, Endonezya, başûrê Kurdistanê û Yemen jî tê de li 30 welatên din jinan sinet dikin." Dema min bihîst li Başûr ev yek heye, yanî gelê min vê kiryarê dike gelek xemgîn bûm û matmayî mam. Belê ez methel mam, şaşwaz bûm, veciniqîm; ji ber ku min nexwest bibêjim dewê min tirş e. Başûrê Kurdistanê di sala 2011'an de bi qanûnan sinetkirina jinan qedexe kiriye, ji yên ku qedexeyê nas nekin 3 sal cezayê zindanê û nêzî 80 hezar dolar cezayê pereyan tê birîn. Her wiha kampanyayên hişmendiyê jî tên meşandin.

Ev kiryar di dînên musewî, xiristiyanî û misilmanan de heye, hema dîsa dibêjim di tu kitêbên pîroz de behsa sinetkirina jinan nayê kirin. Kesên ku vê kiryarê dikin xwe bi dînê ve girê didin, yanî ew dibêjin di dîn de heye.

Jixwe jin her dem xistine bin mehkûmiyeta dînan û bi vî awayî terq, dolab, fêl û êşên bê dawî dane jinan; sinetkirin jî yek ji wan e.

Seqetkirina jenîtal li gor welatan an herêman diguhere. Li hin deveran çermê li ser klîtorîs tê jêkirin, li hin deveran bi temamî klîtorîs tê jêkirin, li hin deveran jî tevî klîtorîs lêvên vulvayê yê hundir û derve tê jêkirin û vajîna jî tê dirûtin, tenê ji bo avêtina îdrar û xwîna cilan tiştekî biçûk vekirî dihêlin mala wan ava!

Sinetker carna jineke bitemen, carna jî porbirekî mêr e; alavên bi kar tînin tişta tûj a li gor şert û mercên wan kîjan be ew e. Mînak; kevirê tûj, cam, jilêtên zingargirtî... Matmayî nemînin wexta li gor civakê mijar jin û namûsa jinan be rûmeta çermê laşê wê jî tune ye. Di demên niha de alavên hîn pêşketî û pratîk bi kar tînin, karmendê tendirustiyê bi lokalanestezî vê wahşetê pêk tînin

Neteweyên Yekbûyî (NY) her sal 6'ê Sibatê (Roja Cîhanî ya Toleransa Sifir ji bo Sinetkirina Jinan ) banga rawestandina vê kiryarê dike.

Gelek jin ji ber vê kiryarê dema diwelidin an sinet dibin ji ber çûyîna xwîna zêde jiyana xwe ji dest dane. Wekî din êşên giran di hêkdankên wan de dibe sedema çêbûna kîstê. Di avêtina îdrar û xwîna cilan de dijwarî, derûniyekê xerabûyî dijîn. Lê bi êşên giran û bêdawî jiyana xwe berdewam dikin.

Li gor zîhniyeta vê kiryarê dike; bawerî bi jinan nabe, jin nikare bi îradeya xwe û zayendîtiya xwe kontrol bike divê bê kontrolkirin. Jixwe divê berî zewacê bi kesekî re nekeve têkîliya zayendî. Heger vajîna wê hatibe dirûtin bi zewacê re ew ji bo mêr û zayînê tê vekirin. Bi vî awayî jin li gor xwesteka mêran pêlîstokek û mekîneyek e, ji bo çêkirina zarokan e. Jina ku sinet dibe paqij e û bêhna genî/îdrarê jê nayê. Ev dişibe pirsgirêka hemû deman; Bakîretî, jinek bakîre be bi namûs e û paqij e.

Dem û dewran û cureyên kiryarên li ser jinan diguhere lê tişta ku di tu dem û dewranan de naguhere êş û bêrûmetkirina jinan e...

Divê em ji bîr nekin a ku vê wahşetê bi dawî bike dîsa jin in, dayik in. Divê dayik goştê laşê keçên xwe bi xwe jênekin, vê xerabiyê bi wan nekin. Gelek jin nikarin giliyê malbatê xwe bikin, divê em civak li ser vê mijarê serwext bin.



Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

## 'Rêwitiya ji bo jiyanê'

Li cîhanê mirovan li şeş deveran bi awayekî paralel, di heman demî de û bêyî haya wan ji hevûdu hebe dest bi jiyana niştecihî kirine û li ser van deveran şaristanî pêş ketiye. Meksîka û Mezopotamya, ango welatê zapatîstayan û kurdan du herêm in ku mirovahî zêdehî dehhezar salî ye li wir bi cih bûye. Yek ji taybetiya hevpar a gelên Amerîkaya Navendî û kurdan ew e ku ew li gel hemû polîtîkayên mêtinger serî li ber serdestan netewandiye. Ev jî sedemeke bingehîn e ku ew îro hîn karin behsa dîroka xwe, behsa rewşa xwe ya niha û behsa pêşeroja xwe bikin. Ango bi gotineke din behsa hebûna xwe bikin.

Par di meha cotmehê de tevgera zapatistayan bi daxuyaniyekê ragihandin ku dê di sala 2021'ê de şandeyên ji endamên xwe bişînin pênc parzemînên cîhanê. Destpêkê şandeyeke ji 7 kesan pêk tê, bi keştiyekê derket ser rê. 13'ê tebaxê şandeya yekemîn gihîşt perava Îspanyayê. 13'ê tebaxê û perava ku kêştî lê danî, di dîroka mêtingeriyê de xwedî cihên taybet in. Lewre ewropî 500 sal berê ji Îspanyayê ber bi Amerîkayê ve bi rê ketine û 13'ê tebaxê li ser xaka niştecihan dest bi qirkirinê kirine.

Şandeyên ji 160 kesî ku ji sedî 75 ji jinan û kesên quer û her wiha ji rêxistinên niştecihî pêk tên, dê li 30 welatên Ewropayê bi rêxistin û tevgerên çepgir, şoreşger, ekolojîk û antîkapîtalîst hevdîtinan li dar bixin. Zapatîstî rêwitiya xwe ya ber bi parzemînan ve wek 'rêwitiya ji bo jiyanê' bi nav kirin. Armanca bingehîn hevkariyên gerdûnî li hemberî baviksalarî û kapîtalîzmê pêş xistine.

Şandeya niştecihan hatina xwe ya Ewropayê bi awayekî îronîk wek 'bişûndegirtin'ê bi nav kirin. Ew bi vî awayî peyama 'we nikaribû me dagir û tune bikira û em niha li vir in' didin û serdana xwe wek serdegirtina antî-kolonyal pênase dikin.

Yek ji rawestgeha şandeya zapatistayan li Ewropayê saziyên tevgera jinên kurd bû. Tevgera jinên kurd wek rêxistineke neewropî lê wek rêxistineke ku li gel Kurdistanê li deverên din û Ewropayê jî kar û xebatên xwe dimeşîne, ji hêla rêxistinên alternatîf ve ji nêz ve tê şopandin. Li ser vê esasê zapatîstiyan xwestin bi jinên kurd re jî hevdîtinê çêbikin. Hem ji bo tevgera jinên kurd û hem jî ji bo zapatîstayan ji welatên xwe bi hezaran kîlometre dûrtir li hev rûniştin û serborî û hêviyên xwe bi hev re parve kirin, kêliyeke dîrokî bû. Di civînên ku hatin li dar xistin de tecrubeyên jinên zapatîstî û kurdan hatin vegotin, xemgînî û kêfxweşiyên têkoşînê, bandorên mêtîngeriyê û berxwedeириyê bi hev re hatin parvekirin.

Ger li gorî plansaziya wan bimeşe, şandeyeke zapatîstî dê biçe Rojhilata Navîn jî û li wê derê li ser axa kurdan bi tevgera azadiyê re jî hevdîtinê çêbike. Lê hevdîtina li Ewropayê ango li dîasporayê xwedî hin taybetiyên xweser e. Yekemîn nîşan dide ku têkoşînên li ser axa xwe, ji bo çareseriya pirsgirêkên xwe hatine avakirin, bandora têkoşîna xwe ya mafdar ji sînorên welatên xwe derbas kirine. Vê yekê avakirina piştgirî û hevkariyê hêsantir kiriye. Duyemîn têkoşînên xwecihî û neteweyî, taybetî jî yên zapatîstayan û kurdan bi paradîgmayên xwe, bi rê û rêbazên ku pêş xistine, ne tenê modelên ser axa xwe ne, ji bo deverên din jî bûne mînak. Ev jî dihêle ku ev tevger her çiqas bi çavkaniya xwe xwecihî û herêmî bin jî di asta bîrdozî de transneteweyî ne. Seyemîn, rêxistinbûyîna li diasporayê ango li derveyî welat di navbera nasnameyên xwecihî û dîasporîk de pirekê ava dike. Li hêlekê temsîla nasnameya xwecihî dike, li hêla din di veguhestina çandên têkoşînê de rolekê dilîze. Û ya çaremîn rêxistinbûyînên li qadên dîasporayê û taybetî jî yên li Ewropayê ji bo rûbirûhatina ewropiyan bi mîrateya xwe ya mêtinger roleke navendî dilîzin. Li ser vê bingehê civîna zapatîstayan û ya kurdan sê peyamên girîng dan ewropiyan; (1) sedemê êş û kesera me polîtîkayên we yên mêtinger bûn, (2) lê me dîsa jî serî li ber we netewand, me li ber xwe da, (3) û em niha we vedixwînin rêya azadiyê.

Ev helwest û îdia ne ji rêzê ye û ne jî bê bingeh e. Du gelên ku ji pêşketina mirovahî û şaristaniyê re mazûbanî kirine, dikarin bi awayên têkoşînên xwe gelan ji pergala kapîtalîst jî rizgar bikin. Çawa ku bêyî haya hevûdu û paralelên hevûdu gava yekemîn a şaristaniyê pêş xistine, dikarin aştiyê û azadiyê jî pêş bixînin. Êdî ew ji hev haydar in û dikarin ji têkoşîn û tecrubeyên hevûdu hîn bibin û bi rêya 'rêwitiya ji bo jiyanê' li cihanê belav bikin.




## Li dijî êrîşa global parastina jiyana azad

Rojnameya mehane ya jinan Newaya Jin ku dest bi dema weşana nû kir, hejmara meha cotmehê bi manşeta 'Li dijî êrîşa global, parastina jiyana azad' hat weşandin. Ronahî Serhad, Yûrdûsev Ozsokmenler, Hêja Zerya, Nîlufer Koç, Nûrhaq Gulbahar, Selma Irmak, Çîmen Aras û Komîteya Kevana Zêrîn tev li kadroyên xwe yên nû kir. Komploya 9'ê Cotmehê, Şehîdên Cotmehê, yekitiya neteweyî, rojeva Tirkiyeyê, rola HDP'yê, çand, penaberî, jineolojî û gelek mijarên din di hejmara meha cotmehê de hatin weşandin. ***AMED***



## Perwerde bi temamî hat qedexekirin!

Piştî destdanîna Talîbanê ya ser rêveberiya Afganistanê jin ji hemû qadan hatin dûrxistin û mafên wan ji dest hat girtin. Yek ji van qadan jî dibistan e. Tevî ku zêdetirî du hefteyan e li Afganistanê dibistan vebûne jî xwendekar û mamosteyên jin nikarin biçin, tenê mêr diçin dibistanê. Ji ber vê bi dehan jinên afgan li rojhilatê paytext Kabulê xwepêşandan li dar xist û banga vekirina dibistanan ji bo jinan kir. Xwepêşandêran pankartên bi nivîsên 'Pênûsên me neşikînin.. Pirtûkên me neşewitînin..Dibistanan negirin' rakirin. Lê belê endamên Talîbanê ji bo tirsandina jinan gule ber bi jor ve reşandin. ***KABUL***



## Li Kerkûkê tundî û kuştina jinan zêde bûye

Rêxistinên mafê mirovan li ser mijara ku li Iraqê û başûrê Kurdistanê tundî û zexta li ser jinan zêde bûye, hişyariyê didin. Li gorî Ofîsa Kerkûkê ya Komîsyona Bilind a Mafê Mirovan a Iraqê tenê li Kerkûkê di nav 6 mehan de bi kêmanî 50 jinan xwe kuştiye û 286 rûdanên tundiyê çêbûne. Komîsyonê diyar kir ji bo jinên ku tundî li wan tê kirin stargeh nînin û ev problem li Bexda û başûrê Kurdistanê jî tê jiyîn. Li gorî raporê piranî jinên di ser 25 salî re bi rêya çekan xwe dikujin. Serokê Ofîsê yê Kerkûkê got ku wan rêveberiya Kerkûkê û saziyên têkildar agahdar kirine da ku çareyek were dîtin. ***KERKÛK***

# Her malbateke girtiyan xwedî înîsiyatîf e

Navenda Nûçeyan

Li gorî daneyên Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) 605 girtiyên bi nexweşiya giran, bi giştî hezar û 604 girtiyên nexweş hene. Bi sedan girtiyên nexweş divê bêne berdan, lê nayên berdan. Dîsa gelek girtî li gel cezayên wan qediya ye ne jî dîsa nayên berdan

Rêveberê MED TUHAD-FED'ê Ahmet Baran, li ser rewşa girtiyên nexweş, tecrîdkirina girtiyan û pergala înfazê axivî. Baran, anî ziman ku 22 sal in li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan tecrîdek heye û wiha got: "Em wekî MED TUHAD-FED'ê tecrîdê şermezar dikin. Bang li hemû sazî û dezgehên mafên mirovan dikin ku ji bo tecrîd bi dawî bibe bi lez înîsiyatîfê bigirin û têkevin nava tevgerê."

Baran diyar kir ku tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan sûcê mirovahiyê ye û wiha axivî: "Li tu welatên cîhanê me tecrîdeke wisa nedîtiye. Ne li gorî hiqûq û sincê ye. Ji bo tecrîd bi dawî bibe em dixwazin CPT bi lez rola xwe bilîze."

Baran da zanîn ku di 27'ê Mijdara 2020'î de li tevahiyên girtîgehên Tirkiyeyê girtiyên siyasî li dijî tecrîdkirina Ocalan dest bi gireva birçîbûnê kiribûn û ev agahî dan: "Greva birçîbûnê 290 rojan berdewam kir. Ev greva birçîbûnê bi pêvajoya "Dem dema azadiyê ye dest pê kir. Em vê çalakiya girtiyên azadiyê pîroz dibînin. Bûne bersiva hamleyê. Piştî 290 rojan biryar dan ku vê berpirsiyariyê bi çalakî û berxwedanên cudatir berdewam bikin. Ev çalakî ji bo me moral e. Bûne bersiva pêvajoyê."

Baran da zanîn ku wekî MED TUHAD-FED jî xwe ji vê pêvajoya 'Dem Dema Azadiyê ye' berpirsiyar dibînin û wiha lê zêde kir: "Di çarçoveya vê berpirsiyariyê de me wekî MED TUHAD-FED'ê kongre pêk anî. Me biryar stendin û bi malbatên girtiyan re bernameyên hevpar pêk anîn. Me malbat anîn cem hev û ji bo xwe ev yek kir armanc."

**Rewşa zêdeyî 300 girtiyan giran e**

Baran bal kişand ser rewşa girtiyên nexweş jî û wiha berdewam kir: "Mijareke din wekî kevneşopiya dewletê nêzîkatiya li dijî girtiyên nexweş heye. Niha gelek girtiyên nexweş ên 25-26-27 sal in girtî ne, hene. Zêdeyî 300 girtiyên nexweş ên rewşa wan giran hene. Mehmet Emîn Ozkan ê 83 salî yek ji van girtiyên nexweş e. Em vê yekê tu carî qebûl nakin. Li tu welatî ev yek nayê qebûlkirin. Lê mixabin ev rewşa girtiyên nexweş ên nayên berdan tenê li Tirkiyeyê heye.

**'Em ê panelan pêk bînin'**

Baran bi bîr xist ku ji bo balê bikişînin ser rewşa girtiyên nexweş dê di 2'ê cotmehê de panelekê li dar bixin û wiha got: "Em ê di 2'ê cotmehê de li Otela Mîtanî panelê li dar bixin. Em ê bi tevlêbûna nûnerên hemû saziyên civakî û parêzvanên mafên mirovan vê panelê pêk bînin. Dîroka wê hatiye diyarkirin. Wekîl û qada siyasî jî dê beşdar bibin. Em ê li ser mijarên betalkirina înfazê, rewşa girtiyên nexweş û edaletê nîqaş bikin. Panela ewil dê li Amedê û panela duyemîn jî dê li Stenbolê pêk bê. Em armanc dikin ku panelên 3-4'emîn jî li dar bixin. Piştî van panelan em armanc dikin ku komxebatekê li dar bixin."

**Dê lîsteyê nûjen bikin**

Baran li ser lîsteya girtiyên nexweş jî rawestiya û wiha got: "Em ê lîsteya girtiyên nexweş nûjen bikin. Lîste kevn bûne. Em ê li hemû Tirkiyeyê û Kurdistanê lîsteya girtiyên nexweş nûjen bikin. Dîsa em ê lîsteya girtiyên ku înfaza wan şewitiye nûjen bikin. Bi giştî çend girtî înfaza wan şewitiye. Em ê tespît bikin û nû bikin. Xebata vê yekê didome. Piştî me lîste nûjen kir em ê parve bikin. Em armanc dikin ku di nava 2 hefteyan de vê lîsteyê temam bikin."

**Her malbat xwedî înîsiyatîf e**

Baran, bal kişand ser Nobeta Edaletê ya Malbata Şenyaşar jî û wiha lê zêde kir: "Li dijî malbata Şenyaşar bêedaletî û bêhiqûqî heye. Ji ber vê yekê Malbata Şenyaşar Nobeta Edaletê digire. Em vê sekn û berxwedana wan wekî MED TUHAD-FED pîroz dikin û piştgiriyê didin wan. Nêzî 9 hezar malbatên girtiyên azadiyê hene. Em bang li hemû malbatan dikin ku li dijî bêedaletî, bêhiqûqî, zext û tundiya hikûmeta AKP-MHP'ê, li cihê xwe bibin deng û înîsiyatîf. Divê her malbat bibin dengê girtiyan. Di vî milî de hemû malbatên me xwedî înîsiyatîf in. Divê her malbatên me bi xwe înîsiyatîfê pêş bixin. Divê her malbat li cihê xwe têkevin nava tevgerê. Biçin saziyan û rêxistinan ziyaret bikin. Divê rêxistin û saziyan têxin nava tevgerê. Divê saziyan jî têxin nava xebatê û xebatê hevpar bikin."

**Tirkiye bûye girtîgeh**

Baran li ser tecrîdkirina girtiyan jî rawestiya û wiha pê vde çû: "Em hemû tecrîdkirina Birêz Ocalan dizanin. Bi tecrîdkirina Ocalan re li ser hemû girtiyan tecrîd belav bûye. Êdî Tirkiye bûye girtîgeh. Li her bajar û navçeyan girtîgehan ava dikin. Li şûna dibistanan ava bikin, girtîgehan ava dikin. Dixwazin hemû civakê bavêjin zindanan. Xuya ye ku îtîfaqa AKP-MHP'ê bi avakirina girtîgehên nû dixwaze di rojên pêş de çi bike. Divê hemû civak û gelê me vê yekê bibînin. Dixwazin bi avakirina girtîgehan bêtir cihê girtiyan teng bikin û girtiyan sirgûn bikin. Dixwazin girtiyan dîl bigirin û zextan pêş bixin. Her çend dizanin ku bi van zextan nikarin vîna girtiyan bişkînin jî dîsa van zext û tundiyan li ser girtiyan didomînin. Divê malbat di mijara înfazê de li girtiyan xwedî derkevin. Em ê her tim mafê wan ê heq û hiqûqê biparêzin. Lê ev tenê bi me nabe. Divê hemû malbatên me û gelê me jî li cem me bin."



**Girtiyan tu carî serî danenîye**

Baran, li ser girtiyên ku înfaza wan betal bûye û nayên berdan jî rawestiya û wiha bi dawî kir: "Li ser girtiyan zext hene. Dixwazin vîna girtiyan bişkînin. Ji ber ku ev polîtîka bi ser nakeve dixwazin wan ji aliyê dûr bixin. Li her girtîgehê komisyona çavdêriyê heye. Ev komisyon li gorî xwe biryarê didin. Ev yek jî kirine zagon. Bi serê xwe biryaran didin. Destûr nadin ku girtiyên cezayê wan qediyane bêne berdan. Dîsa li gorî xwe peymanek nivîsîne û vê peymanê bi girtiyan didin îmzekirin. Di vê peymanê de nivîsa 'Ez poşman bûme. Ez ê tev li van çalakiyan nebim. Daxwaznameyek amade kirine û dixwazin vê daxwaznameyê bi girtiyan bidin îmzekirin. Girtiyên vê yekê îmze nakin înfaza wan dişewitînin û destûr nadin ku bêne berdan. Van girtiyan bi salan li dijî zext, tundî û îşkenceyê serî danenîne. Tu carî tawîzan nadin û daxwaznameyan îmze nakin. Ji ber vê yekê wan bernadin. Em ê panelê amade bikin. Em ê vê mijarê jî nîqaş bikin. Saziyên me yên Botan, Serhed, Ege û Marmarayê jî xebatên betalkirina înfazê dikin. Di aliyê hiqûqê de lêgerîna me didome. Em ê daxwaznameyekê amade bikin û ji saziyên mafên mirovan û hiqûqê yên Ewropayê re bişînin. Hevalên me yên hiqûqnas xebata wê dikin. OHD xebata vê yekê dike. Piştî hejmara kesên înfaza wan betal bûye diyar bû em ê bi raya giştî re parve bikin û li gorî wê em ê gavan biavêjin. Em ê ewil serî li rêyên hiqûqiya navxweyî bidin û piştre serî li saziyên hiqûqa navdewletî bidin."

Divê malbatên me li cem me bin. Em jî li cem wan in. Em ê bi hev re bi ser bikevin. Em ê bang li hemû saziyên me yên hiqûq û mafên mirovan bikin. Em ê bi ÎHD, TÎHV, OHD û saziyên din re nîqaşan bikin."

# Pêdivî bi yekitiya têkoşînê heye

Navenda Nûçeyan

Endamên DAIŞ'ê di 20'ê tîrmeha 2015'an de li dijî ciwanên ku bi pêşengiya Federasyona Komeleyên Ciwanên Sosyalîst (SGDF) li Navenda Çandê ya Amarayê kom bûbûn û xwestin pêlîstokan bibin ji zarokên Kobanê re, êrîşeke xwekujiyê pêk anîbûn. Di vê êrîşê de 33 ciwan hatibûn qetilkirin. Danişîna 20'î ya der barê êrîşê de di 29'ê îlonê de li Dadgeha Cezayê Giran a 5'an a Rihayê pêk hat. Di danişînê de daxwazên parêzerên Malbatên Pirsûsê hatin redkirin û parêzeran jî bi hinceta "heyeta dadgehê ne serbixwe ye" doza redkirina dadger kir. Danişîn taloqî 22'yê cotmehê kirin.

Birîndarê Komkujiya Pirsûsê û Hevserokê Giştî yê Partiya Sosyalîst a Bindestan (ESP) Şahîn Tûmûklû tev li danişînê bû. Tûmûklû geşedanên 6 salên dawî û daxwazên Malbata Şenyaşar ji Ajansa Mezopotamya (MA) re nirxand. Tûmûklû der barê geşedanên di danişîna 20'î ya komkujiya Pirsûsê de qewimîn wiha got: "Çûna Kobanê, di şexsê Kobanê de çûneke ji bo wekheviya gelê kurd û tirk bû. Ji bo aştiyê bû. Dewlet ji ber vê çûnê bêzar bû. Ev komkujî pêngava ewil a plana rûxandinê bû. Di danişîna dawî de plana rûxandinê derketiye holê û daxwazên parêzeran ji ber vê hatine redkirin. Kifş bû ku daxwazên parêzeran dê bêne redkirin. Ji ber ku kiryarê komkujiyê diyar in. Hemû kesên ku haya wan ji organîzasyona vî karî û îstixbarata wê hebûn hemû muxatabê vî karî ne. Hewl didin ser berpirsiyarên siyasî binixumînin."

**Her tişt li ber çavan e**

Tûmûklû da zanîn ku heya ku ev îqtidar bi van kodan bijî ne pêkan e ku ji bo Robozikê, Dayikên Şemiyê, Kemal Kûrkût, Malbata Şenyaşar edalet pêk bê. Tûmûklû anî ziman ku li ber Edliyeya Rihayê serdana Nobeta Edaletê ya Malbata Şenyaşar kirine û wiha axivî: "Komkujiya Pirsûsê ji bo pêşeroja rejîmê û siyaseta herêmê komkujiyeke pir komplîke bû. Qetilkirina Malbata Şenyaşar rastiyeke pir tazî ye. Parlementerekî îqtidarê û birayê wî li ber çavên her kesî malbatek qetil kirin. Lê dozger û peywirdarên dewletê vê yekê nabînin û lêpirsînê wê nakin."

**Pêdivî bi têkoşîna hevpar heye**

Tûmûklû diyar kir ku pêdivî bi yekitiya têkoşîna malbata Şenyaşar û têkoşîna Pirsûsê heye û wiha got: "Em bang li her kesî dikin ku di 22'yê cotmehê de dema biçin dadgeha Pirsûsê, biçin tev li çalakiya Malbata Şenyaşar bibin. Bibin dengê têkoşîna ji bo edaletê ya Malbata Şenyaşarê jî. Bang li her kesî dikim ku têkoşînê bilind bikin."



# Gelê Silêmanî çekên kîmyewî şermezar kir

Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê, li Silêmaniyê çekên kîmyewî ya ku Tirkiyeyê li herêmê bi kar anî şermezar kir. Ciwanan bang kir û xwest her kes li dijî bikaranîna çekên kîmyewî bibin xwedî helwest. Komek endam û rêveberin Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê, helwesta Tirkiyeyê ya li dijî gerîlayan bi çalakiyekê şermezar kir. Ciwan li kolana Sehule ya Silêmaniyê kom bûn û çalakî li dar xistin. Ciwanan di çalakiyê de dirûşmên, "Bijî berxwedana gerîla", "Bimre xiyanet" û "Birûxe faşîzim" berz kirin. Endamê Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê Şehîn Ranya wiha got: "Ji ber artêşa Tirkiyeyê li herêmê têk çû dest bi bikaranîna çekên kîmyewî kiriye." ***SILÊMANÎ***

# Cezayê wî qediyaye lê hê jî girtî ye

Girtiyê 51 salî Hamdîn Demîrkiran ku bi hincetên siyasî cezayê muebedê lê hatiye birîn, 30 sal in girtî ye. Diviyabû Demîrkiran di 23'yê îlonê de bihata berdan, lê bi hinceta cezayê dîsîplînê wî bernadin. Di salên dawî de zêdeyî 100 girtiyên nexweş mirin. Bi sedan girtiyên nexweş jî bi hincetên cur bi cur nayên berdan. Di demên dawî de înfazên hin girtiyên nexweş jî bi hincetên cuda tên taloqkirin. Yek ji van girtiyan jî Hamdîn Demîrkiran ê 51 salî ye. Demîrkiran di sala 1991'ê de hatiye girtin û cezayê muebedê lê hatiye birîn. Demîrkiran ji ber ku cezayê xwe temam kiriye diviyabû di 23'yê Îlonê de ji Girtîgeha Balikesîrê ya Tîpa L'yê derketaya. Her çend Desteya Çavdêriyê ya Îdareya Girtîgehê rapora "rewşa baş" daye wî jî Dadgeriya Înfazê ya Girtîgehê wî bernade. Dadgeriyê bi hinceta cezayê dîsîplînê înfaza Demîrkiran taloq kir. ***AMED***

## DEWLETBÛYÎN DI DÎPLOMASIYÊ DE NE KRÎTERA ESASÎ YE

# Gelê kurd hêza herî mezin a bêdewlet e

Bahadîn Akhan

*Dîroka dîplomasiyê bi qasî dîroka mirovahiyê kevnar e. Dîplomaasî wekî rê û rêbazeke çareserkirina kêşe û gelemşeyan peyda bûye. Di hemû serdeman de rewşa heyî bi rêya dîplomasiya navneteweyî hatiye dabînkirin. Rewşa îro ya cîhanê jî yekser bi dîplomasiyê re girêdayî ye û meşandina dîplomasiya îro ya navneteweyî û navdewletî teşe dide cîhanê. Me der barê, dîrok û rewşa dîplomasiya cîhanî, ya Rojhilata Navîn û nexasim ya kurdan de bi parlamenterê HDP'ê Doçent Dr. Ahmet Yildirim re hevpeyvîn kir. Ka em bi hev re guh bidêrin, çi heye çi tune ye.*

**Gelo dîplomasî ji bo gelên bindest tê çi wateyê? Û dîplomasî li cem wan çawa teşe digire?**

Helbet çawa ku dewletbûyîn di gelek qadan de derfetên berfireh ji bo mirov peyda dike di qada dîplomasiyê de jî heman derfetan dide dabînkirin. Lê belê rêbaza meşandina dîplomasiyê û dezgeha wê ne tenê dewlet e. Li gorî min ji bo gelên bindest yên bêdewlet du rêyên girîng yên meşandina dîplomasiyê hene. Rêya ewil ev e: Divê hûn mafdarbûna xwe baş bihûnin û xwe baş derbirin. Rêya duduyan jî divê tu xwedî hêz û şiyaneke birêxistinkirî bî. Di pêvajoyên dîplomatîk de mafdarbûn û mezlûmbûna we û dubarekirina vê rewşê tenê têrê nake. Ev yek dikare bibe sedem ku hêzên hûn pê re hevdîtinan dikin tenê dilê xwe bi we bişewitîne. Ev jî bi awayekî dîplomatîk tu destkeftinan nade we. Heke hûn mafdar bin û digel vê hêzeke we ya birêxistinkirî hebe helwesta ku dê ji bo we bê nîşandan dê ne dilşewitandin lê rêzgirtin be.

**Di pergala kapîtalîzmê de dîplomasî şûna çareserkirina şeran û dabînkirina aştiyê bêhtir rê li ber pirsgirêkên din vedike. Gelo dîplomasiya ku îro tê meşandin xizmeta çi dike?**

Tu hêzeke emperyal bêyî ku berjewendiya xwe jê werbigire bi gelên niştecih û herêmî re bi tu awayî têkiliyên li ser esasê aştî, maf, azadî û demokrasiyê danayne, dîplomasiyê nameşîne û pirsgirêkan çareser nake. Hemû zirhêzên cîhanî têgehên wekî aştî, demokrasî, azadiyê li cihên cuda yên cîhanê mîna amûreke polîtîkayên xwe yên berbelavbûnê bi kar tînin. Lê belê dîsa heman zirhêz dikarin bi gelên ku gihîştine asta hêzeke birêxistinbûyî û vê hêza xwe derxistine holê re dîplomasiyê bimeşînin û li ser hin xalên hevpar li hev bikin.

Ser meseleyê di sala 2014'an de dema DAIŞ mîna vîrûsekê bi awayekî bêdawî li Rojhilata Navîn belav bû hêzên navdewletî mudaxeleyê wê nekirin.

Lê belê di Cotmeha 2014'an de DAIŞ hat ber derê Kobanê û bajêr dorpêç kir. Dema cara ewil kurd li 4 parçeyên Kurdistanê û li cîhanê li dijî vê dorpêçê rabûn ser pêyan û wan yekitiya xwe ya neteweyî û hêza xwe ya cewherî ya birêxistinkirî nîşanê cîhanê dan, ew zirhêzên cîhanê neçar man ku di bin navê hêzên koalîsyonê de bicivin û ji hewayî ve mudaxeleyî şer bikin. Ango mudaxeleya hêzên koalîsyonê ya di Cotmeha 2014'an de ne lutfek bû ne jî ji bo bejn û bal û timtêla kurdan bû. Ew jixweber tevnegeriyan, ji ber ku kurdan li seranserî cîhanê hêza xwe ya birêxistinkirî û yekitiya xwe nîşan da, hêzên koalîsyonê neçar man tevbigerin.

**Dîplomasiya gelê kurd a ku di navbera çar netewedewletan de parçe bûye bi awayekî çawa tê meşandin? Mirov têkiliyên di navbera dewletên dagirker û siyaseta kurd de dikare çawa binirxîne?**

Ya rastî mirov nikare bibêje ku di demajoya dîrokî de dema kurdan dîplomasiya xwe bi pêş xistine miqateyî temamiya berjewendiyên gelê kurd bûne. Berjewendiyên gel tim bûye goriyê polîtîkayên dostanî, aştî û biratiya gelan û heta roja me jî wisa bûye. Îro jî kurd êşa vê yekê bi awayekî giran dikşînin.

Wekî di gelek qadan de jî dixuyê ji ber ku kurdan yekitiya xwe ya neteweyî pêk neanîne û ji ber ku berjewendiyên partîgerî, herêmî û hozwarî (eşîretwarî) derketine pêş di warê dîplomasiyê de gelek lawaz mane. Lê belê heke li ser bingeheke rast û rêgezî bê nirxandin 4 parçebûn ne ji bo yekitiya neteweyî ne jî di arenaya navneteweyî de ji bo bipêşxistina dîplomasiyê nabe astengî û divê nebe jî.

Di eslê xwe de dîroka 100 salên dawî ya kurdan ji aliyekî ve jî dîroka xapandina li ser maseyê ye. Di têkoşîna lêgerîna mafên xwe de gelê kurd ji têkçûna şer wêdetir ji ber niyeta xwe ya pak li ser maseyan hatiye xapandin û bi vî awayî jî ji mafên xwe yên neteweyî bêpar maye.

**Digel ku di van salên dawî de dîplomasiya kurdan pêş dikeve jî dewleta Tirkiye û Îranê hewl didin rê li ber vê yekê bigirin û ji bo vê yekê jî gelek dîplomatên kurd kirin hedefa xwe. Gelo armanc ji vê hedefgirtinê çi ye?**

Her çar dewletên serdest ên ku gelê kurd parçe kirine, ji bo berjewendiyên xwe, nakokiyên navxweyî yên kurdan û parçebûna wan pir baş bi kar anîne. Di van salên dawî de digel ku gelê kurd hêza xwe ya herêmî û cîhanî zêde dike jî ji aliyekî din ve ji ber sedemên pûç yekitiya xwe ya neteweyî nikare dabîn bike û her ku diçe jê dûr dikeve. Gelekî ku nikaribe yekitiya xwe ya neteweyî û tifaqa xwe pêk bîne dê nikaribe li hemberî tehdîdên derveyî xurt û qewîn raweste û ev yek dê ji bo wî zehmet be. Lê gelên ku yekitiyên xwe yên neteweyî pêk anîne û di pêvajoyên dîplomatîk de bûne yek, dê li hemberî hêzên birêxistinkirî û hemû hêzên herêmî û cîhanî rastî helwestên girambar bên.

> Karê ewil yê hemû hêzên ku dixwazin li Rojhilata Navîn aramî, aştî û nirxên gerdûnî bi cih bikin ew e ku divê ji bo bidestxistina mafê winda yê 100 salên dawî yê dîroka kurdan rêzê bigirin û pêwîst e di vê rêyê de bikevin nav hewldanên nû



**Piştî şerê li Sûriyeyê û avakirina Rêveberiya Xweser a li Rojava danûstandinên dîplomatîk ên li cem kurdên Rojava pêş ketin. Lê belê di vê mijarê de dîplomasiya navbeynkar a hêzên din net nîne. Gelo astengiyên li pêşiya naskirina statuya Rojava çi ne?**

Statu û hêza dîplomatîk a ku li Rojava hat bidestxistin destkeftina hevpar ya hemû kurdên li cîhanê ye û ev pir bi nirx e. Lê belê statuya îro ji aliyê siberojê ve tu tiştî nikare garantî bike. Pêwîst e ev destkeftin bên berfirehkirin, bên sazûmankirin û bên mayîndekirin. Rêya vê yekê jî ev e: Divê hemû kurdên li cîhanê yekitiya xwe ya neteweyî û tifaqa xwe pêk bînin, xurt bikin û vê hêza xwe jî bi awayekî efektîf bi dîplomasiyê re biguncînin. Dema ev yek pêk hat hemû zirhêzên ku dest li Rojhilata Navîn werdane dê neçar bimînin ku ajandayên xwe yên xumam yên li hemberî Rojava û gelê kurd net bikin.

**Di van demên dawî de trafîka dîplomatîk a li Rojhilata Navîn û herêmên ku şer û krîz lê hene zêde bûye. Li gorî te armanca van serdanan çi ye? Gelo rewş û pêvajoyeke nû li pêşberî me ye?**

Ya rast wekî serokên dewletên mezin, armanca serdanên pêşengên dînî û ruhanî yên di bin navê nirxên şaristaniyê û gerdûnî de li Rojhilata Navîn pêk tên ev e: Ew dixwazin vê bêaramiya li Rojhilata Navîn li gorî berjewendiyên xwe dagirin. Xêncî wê ne tu tiştek e. Hekena karê ewil yê her hêza ku dixwaze li Rojhilata Navîn aramî, aştî û nirxên gerdûnî bi cih bike ew e ku divê ji bo bidestxistina mafê winda yê 100 salên dawî yê dîroka kurdan rêzê bigirin û pêwîst e di vê rêyê de bikevin nav hewldanên nû.

**Li gorî te kêmasiyên dîplomasiya kurdî çi ne?**

Qadên potansiyel ên diyar ên di dîplomasiyê de bi awayekî serkeftî nayên bikaranîn û ev kêmasiyeke cidî ye.

Ferq û valahiyên mezin di navbera hêza girseyî ya diyasporaya kurd a li Ewropayê de û bikaranîna vê hêzê di dîplomasiya Ewropayê de heye. Lewra diyasporaya kurdan a li Ewropayê xwedî derfetên wisa ne ku di destê tu neteweyeke bindest a dîtir de tune ye.

Her wiha piştî 2014'an berxwedanên li Rojava û destkeftinên wan bû sedem ku gelê kurd di arenaya navneteweyî de bê nasîn û rêz li wan bê girtin. Lê belê mirov nikare bibêje ku ev yek bi awayekî serkeftî û kartêker hatiye bikaranîn. Li gorî min kêmasiyeke dîtir jî ev e: Wekî kirdeyê siyaseta legal/demokratîk derfetên HDP'yê bi awayekî têrker nayên bikaranîn. Digel vê di dîplomasiyê de sazûmanbûn û domdariyê jî tune ye û ev yek li cem kurdan dibe sedemê kêmasiyan.

Belê rast e, gelê kurd li gorî rabirdûya xwe ya dîrokî îro di pêşxistina dîplomasiyê de di asteke baştir de ye. Lê belê dijwar e ku mirov bibêje ev ast li gorî dil e. Di navbera têkoşîna bi dehsalan ya ku tê dayîn, berxwedan û berdêlên ku tên dayîn û destkeftinên di qada dîplomasiyê de hatine bidestxistin cudahiyeke mezin heye.

**Li başûrê Kurdistanê jî rojev û pêvajoyeke germ heye. Dîplomasiya başûr çima nikare di nav xwe de hevgirtî û yekgirtî be û rê li ber pêşdeçûna dagirkeriyê bigire?**

Di sala 2003'an de ji îlankirina Dewleta Federe ya Kurdistanê û vir ve rêveberî hem bi hêzên cîhanî hem jî bi hêzên herêmî ve hat girêdan û ev yek kêşeyeke bingehîn ya dîplomasiya kurdan e. Bêguman bi Enqere, Bexda, Tehran û Şamê re û bi cîranên dûr re têkiliyên nêz dikarin bên danîn û divên bên danîn jî. Lê belê divê awayê vê têkiliyê li ser rajêrî û pêvegirêdanê nebe, divê li gorî dîplomasiyeke birêgez be. Gava we dîplomasiyê bi kompleks û pelçiqîbûna yên mezin/biçûk, xurt/lawaz ve dorpêç kir jixwe hûn dê nikaribin qezenc bikin. Li gorî min nexweşiya Başûr a herî mezin ev e. Lê jeopolîtîka Kurdistanê dike ku hêzên herêmî û cîhanî muhtacî kurdan bibin. Dema em ji vir bigirin dest jî em dê çak bibînin ku di dîplomasiya kurdan de destê gelê kurd ewqas jî lawaz nîne heta pir xurt e.

**Herî dawî li Bexdayê lûtkeyek çêbû û ji bo meseleyên li Iraq û Sûriyeyê guftûgoyek hat pêşxistin. Di heman hefteyê de heyete DYAyê serdana Rojava kir û bi Meclisa Sûriyeya Demokratîk re hevdîtin kir û heyetên MSD'yê jî hevdîtinên dîplomatîk kirin. Hûn van yekan çawa dinirxînin?**

Di lûtkeyên bi vî rengî de divê beşdarbûna kurdan bi jixwebaweriyeke mezin çêbibe. Dewletbûyîn bi bandor e lê di dîplomasiyê de tekane krîter ne ev e. Divê kurd di hemû platforman de jixwebaweriya hêza xwe ya jeopolîtîk û rêxistinkirî bidin xuyakirin. Li aliyekî gelê kurd gelheya herî mezin a bêdewlet temsîl dike lê divê neyê jibîrkirin ku li aliyê din jî gelê kurd hêza herî mezin a cîhanî ya bêdewlet e. Ev rewş qadeke tevger û bizavê ya bêhempa bexşî kurdan dike. Divê di ferqa vê yekê de bin û bi vî awayî dîplomasiya xwe pêş bixin.

**Li cem kurdan û di siyaseta wan de rojeva sereke tecrîda li Îmraliyê ye. Gelo siyaset û dîplomasiya kurdan a li bakurê Kurdistanê di mijara tecrîdê de gavên çawa diavêje, kêmasiyên wê çi ne û divê çi bê kirin?**

Li gorî min sedema bingehîn ya tecrîda li Îmraliyê ev e ku birêz Ocalan xwedî bandoreke civakî ya xurt e û der barê pirsgirêkên herêmî yên Rojhilata Navîn de perspektîfên çareseriyê dikare pêşkêş bike; ev kapasîteya wî heye. Di hevdîtineke bi çend saetan ya ku îro bê kirin de jî der barê kurdan, polîtîkayên herêmî û xitimînên ku tên jiyîn de dê rêyên çareseriyê bibîne û pêşniyazên xwe pêş bixe. Lê dê li aliyê aştî, diyalog û çareseriyê be ku ew dê bi van yekan xitimîna herêmî ji holê rake, dê bikaribe ji wê tengava cengî bibuhire. Ji ber vê yekê sedema tecrîdê tenê bi Tirkiyeyê ve sînordarkirî nîne, para hemû hêzên ku li Rojhilata Navîn alîgiriya şer, kaos û cudabûna civakî dikin di vê tecrîdê de heye.



## Ahmet Yildirim kî ye?

Doçent Dr. Ahmet Yildirim, di sala 1972'an de li Amedê hatiye dinyayê. Mastera xwe li Stenbolê, doktoraya xwe jî li Enqereyê di beşa Ziman-Dîrok û Erdnîgariyê de bi dest xist. Di ber akademîsyeniya xwe de, di sazî û dezgehên kurdî de karê aktîvîstî û rêvebiriyê kir. Di hilbijartina 7'ê hezîrana 2015'an de bû parlamenterê Mûşê. Di sala 2018'an de ji ber gotinên xwe yên der barê serokkomar Erdogan de parlamenteria wî hat betalkirin û salek 2 meh cezayê girtinê lê hat birîn.



Samî Hêzil

# Teorî û rexneya wêjeyê

Di rojeva wêjeya kurdî de nîqaşên têkildarî teorî û têgehên wêjeyî gelek caran bi helwestên reaksiyonî çêdibin. Heta hin caran ev helwesta neyînî bi şêweyekî wisa tê bilêvkirin ku gumanbariyeke aşkera der heqê pêwîstî û derbasdariya teoriyan û têgehên esasî yên rexneya edebî de xuya dibe. Famdarî ye, xudanên wan bertekên neyînî yên li hemberî teorî û têgehan di heman demê de nivîskarên metnên edebî ne, lewre dîroka wêjeyê bûye şahidê xirecira navbera afirîner û dahûrîneran. Li aliyekê nivîskarên metnên afirîner û li aliyê din jî nivîskarên metnên ku rexneya metnên yekem dikin. Lê dîsa jî divê bê gotin ku ev xirecir û gengeşî jî dawiya dawî di asteke teorîk û têgehî de çêbûne, anku ji teorî û têgehan pêk hatine û bi wan meşiyane. Jixwe wêjeya cîhanê li ser bingeha teorî, ranêzikî, têgeh û helwestên wêjeyî yên hevpar/dijber ava bûye.

Bi giştî tê qebûlkirin ku teorî rê vedike da ku berhema wêjeyî baştir bê fêmkirin, peyam û niyeta nivîskaran – ger hebe– bêtir zelal bibe. Wek encam jî bi vê tevkariya teoriyê kalîteya edebî bi pêş de diçe, hem ji hêla berhemdayînê û hem jî ji hêla nirxandin û şîroveyê ve. Bi pîvan, çarçove û helwestên ciyawaz ên teorîk deqên wêjeyî di qadên nû de û bi bergehên nû tên nîqaşkirin û nirxandin. Wek mînak em bibêjin, bi rexneya psîkanalîtîk nirxandina li ser bingeha derûniya karakter û nivîskar, bi rexneya femînîst rol û temsîla jinê ya di konvansîyona edebî de, bi rexneya marksîst, têkiliya çînên civakê, îdeolojî û berhema edebî, bi post-binyadgerî û hilweşangeriyê rexneya rastiyên gerdûnî, nepêkaniya waterdarkirina proseya xwendinê û gelek tiştên din ên bi vî rengî di rojeva wêjeyê de bi cih bûn û rêça rexne û nirxandinê diyar kirin.

Her wisa hebûna teoriyên wêjeyî yên têvel û metodên wan ên resen derfetên girîng pêşkêş dikin ji bo nirxandinên berfireh û cihêreng. Wek mînak, teoriyên ku xwe dispêrin xebatên çandî berê dahûrînê didin konteksta çandî, ranêzikiyên formalîst bala mirov dikişînin ser hêmanên formel, xasyetên zimanî û teknîkên taybet. Bi heman awayî, rexneya marksîst, psîkanalîtîk, post-modern û yên din tev bi pêşekî, deqbend û metodên xwe yên nirxandinê derfetên cuda yên dahûrînê dabîn dikin û qada metnê berfireh dikin.

Em angaşta xwe bi mînaka romanê bidomînin. Roman cureyeke edebî ye û xwedî xasyetên kifşe yên cureyî ye. Di dîroka wê ya sê sed salan de –em xizmên wê yên qedîm li derve dihêlin– bi teknîkên nû, bi tercîhên mijar û temayên nû, bi şêwazên vegotinê yên cihêreng sînorê wê yê terîfkirinê berfirehtir bû. Roman di çarçoveya xasyetên hevpar û pejirandî de bû xwedî terîfeke cureyî, li gel vê terîfa hevpar a cureyî, cihêrengiya nêrînên der barê romanê bi giştî hat parastin û bi vê têkiliyê jî dewlemendiya romanê çêbû. Bi kurtasî, roman hem xwedî têgeh û pîvanên pênasekirinê yên pejirandî û hevpar e û hem jî xwedî nêrînên cuda yên şîrovekirinê ye û hemû hewldanên pênase û şîroveyan jî li vê çarçoveya fireh (carinan şêlû) ê teorîk û têgehî diqewimin.

Dema ku romana kurdî bi giştî, yan jî romanek û romanûsê wê tê nirxandin, eger ku cihê berhemê di nav konteksta cîhanî ya wêjeyê de neyê destnîşankirin; tercîhên romanûs, rastiya berhema wê/î –hem ji hêla arkeolojiya metnê, hem jî ji hêla referans û tilnîşanên wê– bi hemçax û trendên heyî re neyên berawirdkirin; berhema ku wek roman tê pêşkêşkirin eger li gor pîvan, qayde û hêmanên cureya romanê neyên tehlîlkirin; eger helwesta berhemê/nivîskêr û tevkariya wê ya li cureya romanê neyê watedarkirin, wê çaxê mirov nikare bi awayekî rêkûpêk û têgihîştî qala romanekê û nivîskarê wê bike. Heta mirov ê nikaribe behsa çandeke rexneyî û hebûna rexnegiran jî bike.



Em bivên an nevên, çarçoveyeke teorîk û têgehî ji bo nirxandinên deqên wêjeyî tiştek esasî ye. Ancax bi diyarkirina çarçoveyeke teorîk nirxê berhemê yê di nav nerîta cureyê de dikare bê tayînkirin.

Bêguman redkirina hin teorî û têgehan, an jî redkirineke gelemperî mafekî fikrî ye. Lê divê neyê jibîrkirin ku berpirsiyariyeke li ser wan mirovan ferz dibe yên ku teoriyên heyî red dikin. Lewre yên ku hin teorî û têgehan red dikin, divê ew teorî û têgehên xwe yên nû biafirînin û ta radeyekê jî bidin pejirandin.

Yên ku teoriyê bi giştî red bikin jî divê pîvanên xwe yên nû yên nirxandinê dest nîşan bikin.

# Di xerîbiyê de hêvî û bendewarî

Sayîme Xakpûr

Dema min serê sibehê çavê xwarziya xwe, Dîlbera nazik û biçûk ku di xeweke şêrîn de raketibû maç kir û xatir ji malê xwest, qêrîneke wisa kete nava dil û hinavên min: Eger dengê wê bida der, dê volqana çiyayê Agiriyê bêdeng maba û fedî bikira. Bi gavên lerzok û dilê ji her deriyekê ji xeman dagirtî û çavên mîna gola rondikan, min xatir ji Dîlbera biçûk, yadîgara Şêrdil, heval û hevrêyê xwe xwest û destên dayê û bavo maç kir. Bêyî ku bizanim qederê çi planek ji min re amade kiriye, bi rê ketim.

Bavê nexweş, bavê ku êşa wî bi salan e ji min re bûye kula li ser kulan û dilê min bi yek carê difetisîne û ji hebûna xwe tême tengezariyê, malbata bendewar û ya herî bieş, Dîlbera biçûk dihêlim û ji bo cara dawiyê axa ku bêhna zarokatiya min jê dihat; min bêhn kir û xatir ji xewn û xeyalên xwe yên ku min bi salan raçandibûn xwest.

Niha li ku me ez jî nizanim, çend sal ji ser wê roja xatirxwestinê re derbas bûye, wê jî nizanim. Tekane tişta ku ji bîr nakim û heta hetayê ji bîr naçe, soza ku min ji Şêrdil re dabû bi xwe ye; nayê jibîrkirin. Berî ku ji wir derkevim min serdana gora wî kir.

Ah Şêrdilê delal, heval û hogirê min yê bi salan, tu ji can şêrîntir bûyî ji bo min, ji heyv û tavê bi rontir bûyî, bi salan e te xatir ji min xwestiye û ez jî xatir ji axa me her duyan dixwazim. Soz, ez ê heya dawiya jiyana xwe li Dîlbera te ya biçûk xwedî derkevim û nehêlim nebûna bav hest bike û nehêlim rondikên bêhêvîtiyê bibarîne..

Li qeraxa penavê rûniştime û tava heyvê şewq vedaye her derê. Bi sedan mirov li wê şeva tavîn bê hêvî pala xwe dane dar û keviran û li benda derbasbûna kamyonan in ku derfet çêbe xwe li jêr wan veşêrin û derbasî axa ku ji xwe re wek hêvî û jiyaneke dubare dizanin, bibin. Her yek ji me bi tûrikek tijî xewn, xeyal, daxwaz, hesret û bi dehan hêviyên ji keviran girantir, bendewar li derdorê temaşe dikin û carinan jî axînek ji pola, ji agir gurtir di sîngê me de derdikeve..

Carinan bi dengê qêrîna mirovên ku diketin nava hesinê kamyonan em vediciniqîn û me xwîna laşê wan yê bêxwedî û bêwelat li ser hesinên kamyonan temaşe dikir. Em bi dengê qaçaxberekî ji nava dojeha xeman derketin ku digot: "Siwarî gemiyê bibin em ê li Îzmîrê ber bi Yewnanê ve herin ku we derbasî aliyê din bikin."

Hêvî kete canê me û bi dilekî ku dengê wê digihîşte tava şevê em siwar bûn. Gemiya ku cihê sî an çil kesan bû, heftê kes lê siwar kirin! Ku gemî bi rê ket, bagerê êrîşî canê me kir, em ketin nava pencên mirinê. Divê, ew dem û ew hestên wê demê di kûrahiya dilê yên dîtî û jiyankirî de bê gotin ku her kes bizane rewşa kesên ku ji ber bayê direvin û dikevin ber bagerê çawa ye.

Tu hêviya malbatekê bî û ya herî xembar tu hêviya Dîlbera biçûk bî ku piştî bavê xwe ji te re dibêje: "Bavo Rênas zû were yan jî zû min bibe cem xwe"; w gotin û hestên ku keviran dike av dibe sebeb tu xwe li jiyanê bigirî û ji pencên mirinê bifilitî.

Ne ji bo xwe û ciwaniya xwe, belku ji bo hêviya çavên dayikeke diltenik ku şev û roj navê lawê xwe, ku di dergûşa dil û kezeba xwe de hewandiye, bi dengekî pir şewat tîne ser ziman. Ji bo bavê ku roniya jiyana xwe di hebûna Rênasê lawê xwe de dibîne, jiyan bikî ku hêlîna hêviyên wan hilneweşe.



Ba û bahoza behrê em ber bi deriyê mala mirinê ve birin û dîsa vegerandin, piştî wê em rastî bi dehan pirsgirêkên din hatin ku ne ziman dikare bi lêv bike ne jî ti peyv ji bo gotina wan amade ne.

Du salan bi belengazî, birçîtî, tazîtî, perîşanî, xerîbî, dûrwelatî, nedarî û hejarî, min xwe gihande ser axa welatekî ku jê re dibêjin welatê mirovhezan û li hejar û bêçareyan xwedî derdikeve. Niha piştî çend salan li wî welatê xerîb bi tena serê xwe ji bo pêkanîna miraz û miradê hezkiriyên xwe li ber xwe didim.

Lê bi rastî min xwe ji bîr kiriye, yan jî hatime jibîrkirin? Tişta ku wê gavê di wî welatê xerîban de dikare mirov li ser piyan bihêle û hêzê bide canê mirov dîtina rûyê hezkiriyan e û evîna ku bi wan re heye. Evîn... erê evîn, ez bi wê peyvê çima dikevim kelecanê û dilê min lê dide?

Gelo ez bûme evîndar û haya min ji min nîne?

Gelo ev hêza ku di wan roj û mehên dawiyê de min şa dike ji ku hatiye? Laşê min diêşe, dilê min diperite, bêriya bêhna dayê dikim, bêriya dengê Dîlberê dikim ku ji min re digot: "Xalo, bavo Rênas..."

Gava ew bêrîkirin û hesret min diêşînin evîn tê hawara min...

Of off ma dema hatinê bû, ma te nedizanî ez hîn birîndar im, ma te nedizanî rondikên Dîlbera biçûk hêj necebirîne û birînên Şêrdilê ji can şîrîntir germ in û hilma wê nava çavê min dide... Hat êşek ji wan êşan girantir di wê xerîbistanê de lê nizanim xêr e yan nebixêr e!

# Li Şehbayê bi her awayî berxwedan li pêş e

Fawaz Reşo

Di dîroka mirovahiyê de tu dîrok wekî ya dewleta tirk bi komkujî û sûcên dermirovî tijî nîne. Bi hemû rê û rêbazên hovane bi ser gelan de tê, bi taybet gelê kurd ê li Rojhilata Navîn. Gelê kurd di vî sedsalî de bi xwespartina li fikrê rêber Ocalan ji deryayê ber bi bejahiyê ve diçe. Anku xwe ji mirinê, tunebûnê û tesfiyekirinê rizgar dike.

Li hember vê yekê dijminê gelê kurd, bi taybet dijminê bi salan dewleta tirk a faşîst her cure teknîk û êrîşên topyekun li dijî wî bi kar tîne. Ajan û sîxuran çêdike, şerê taybet dimeşîne, komkujiyan pêk tîne, tecawizê jinan dike û dirêvîne. Lê ev hemû ji bo dewleteke xwe li ser van hîman mezin kiriye û damezrandiye ne nû ye. Lê ya girîng tevahiya dewletên cîhanê li hemberî van sûcan bê deng in.

Dewleta tirk di 20'ê Çileya 2018'an de tevî hemû komên çete yên tundraw û radîkal êrîşî kantona Efrînê ya rojavayê Kurdistanê kir û di 18'ê Adara heman salê de dagir kir. Li hemberî êrîşên dewleta tirk û çeteyên wê şêniyên Efrînê, di 58 rojan de, berxwedaneke bêhempa li hemberî duyemîn hêza NATO'yê raber kir.

Di encama êrîşên hovane û topyekun de şêniyên Efrînê neçar man ku koçber bibin û berê xwe bidin herêmên nêzî Efrînê da ku berxwedana xwe li wir berdewam bikin û vegerin.

Şênî li kantona Şehbayê di bin kavil, xaniyên nîvwêrankirî û kampan de bi cih bûne û li wir karên xwe di sazî, rêxistin, perwerdeyê û hwd. de dimeşînin ku vegerin Efrînê.

Tevahiya saziyên Rêveberiya Xweser a herêma Efrînê li Şehbayê aktîf bûne, hemû saziyên perwerde, çand, şaredarî, komîn û parastinê aktîf in.

**Birêvebirina qada perwerdeyê**

Têkildarî qada perwerdeyê, li kantona Şehbayê xwendekarên Efrînê bi zimanê dayikê dixwînin; ji refa 1'ê heya 12'an. Li gel wê jî peymangeha Şehîd Viyan Amara heye. Her wiha hejmara mamosteyên ku xwendekarên perwerde dikin 815 e, hejmara xwendekaran jî 15 hezar û 724 e û hejmara dibistanan jî 70 ye. Tevî rewşên zehmet ên germa havînê û sermaya zivistanê û di nava dibistanên nîvwêrankirî de şagirt û xwendekarên Efrînê bi israr in zimanê kurdî bixwînin da ku ji dijmin re bibêjin hûn nikarin roja me tarî bikin û em ê Efrînê û Kurdistanê ji hovîtiya we rizgar bikin.

Xwendekar di rewşên nearam de perwerdeya xwe dibînin, mînak rojane êrîşên dewleta tirk a dagirker û çeteyên wê li dijî herêmê hene û li kêlek wê jî hikûmeta Şamê herêmê kiriye nav ambargoyeke dijwar; nahêle ne derman, ne jî mazot ne jî pêdiviyên xwendekaran derbasî herêmê bibe. Lê dîsa jî hem malbat, hem mamoste hem jî xwendekar bi israr in zimanê dayikê bi pêş bixin.



**Çandinî bûye rêya rizgariyê**

Girêdayî qada çandiniyê jî bi koçberiya şêniyên Efrînê re piraniya şêniyên Şehbayê jî vegeriyan warên xwe, lê beşeke biçûk beriya şêniyên Efrînê koçberî Şehbayê bûbûn, hebû. Şêniyên Şehbayê li gel debar, ambargo û rewşa kirêt a aborî dest bi çandiniya zeviyên xwe kirin, tê de; kartol, pîvaz, fasûlî, fîrîngî, xiyar, zebeş û hwd. çandin. Bê guman pêdiviya çandiniyê bi karker û pisporan heye. Bi wê re bi awayekî komînal, hem jî ji bo debar û qûta jiyanî şêniyên her du kantonan, Efrîn û Şehbayê, li nav zeviyan xebitîn. Piraniya zeviyên li Şehbayê yên bejî ne, li gel sebzeyan beşeke mezin ceh tê çandin, li kêlek wê jî beşeke biçûk jî genim tê çandin. Ji ber ku pêdiviya genim bi avê heye û pêdiviya derxistina avê ji bîran bi jeneratorên li ser mazotê dixebitin heye. Ji ber ku kanî û çem tune ne, genim zêde nayên çandin. Her wiha ji ber ku sotemeniyê bernade kantonê ambargoyeke tund jî ji hêla hikûmeta Şamê ve li ser herêmê ye.

**Şaredarî damarê jiyanê ye**

Têkildarî qada xizmetguzarî û şaredariyê jî; di dema serweriya hikûmeta Şamê de giştî bejahî û gundewarên li Sûriyeyê hatibû paşguhkirin, kantona Şehbayê yek ji wan gundewarên bejahiyên Helebê ye ku hatibû paşguhkirin. Rêyên sereke û şaxî hema bêje xerab bûne. Ev rê zêdetir jî di dema serweriya komên çete û çeteyên DAIŞ'ê de hatin xerabkirin. Çeteyan bi mebest rê dikolan, bi top û hawanan armanc dikirin da ku erebe nikaribin bixebitin. Lê bi aktîfkirina şaredariyên girêdayî Rêveberiya Xweser a Efrînê li Şehbayê piranî rêyên sereke û yên şaxî hatin sererastkirin. Li gelê wê jî şaredarî bi xizmeteke sereke ya dayîna avê ji şêniyan re radibe. Ji ber ku bîrên sereke û kanalîzasyonên avê yên binerdê li herêmê tune ne, şaredariyê bîrên berê hatine kolandin aktîf kir, traktor û stêr kirin dewreyê da ku avê li şêniyan bi buhayeke guncaw belav bikin. Ji dema koçberiya şêniyan Efrînê li Şehbayê ev yek ketiye pratîkê, lewra av ji hêmanên sereke yên jiyanê ye. Lê tevî aktîfkirina traktoran ji bo belavkirina avê li şêniyan şaredariyê xezîneyên avê li nava hemû gundên Şehbayê belav kir, bo nimûne li gundekî biçûk zêdetirî 10 xezîneyan hatine belavkirin. Lê dagirtina ava wan xezîneyan ji hêla UNICEF'ê ve bi rêya stêrên mezin pêk tê. UNICEF'ê nêzî 2 hezar û 400 metrekab av li Şehbayê belav dikir, lê nêzî salekê av kêmî nîvî kiriye anku tenê hezar metrekab avê dide. Ev yek jî bi siyasetên navneteweyî yên qirêj ve girêdayî ye, anku li gel ambargoya hikûmeta Şamê û topbarana dewleta tirk a dijwar UNICEF jî bi rêya kêmkirina avê ambargoyekê li ser koçberan dimeşîne.

Li kêlek karên saziyên Rêveberiya Xweser tevî xebat û alîkariyên Heyva Sor a Kurd ji şêniyan re hin rêxistinên cîhanê jî hene. Lê rêxistinên cîhanê li karên xwe yên mirovî ranabin, zêdetir karên îstîxbaratî di nava gel de dikin. Heta niha ji bilî Rêveberiya Xweser tu rêxistinan alîkariyeke guncaw ji şêniyan re pêşkêş nekiriye. Heyva Sor a Kurd mehane selikên(paket) xwarinê li tevahiya şêniyên Efrînê û Şehbayê belav dike.

Qada birêvebirina şêniyan li nav gundan û kampan komîn e. Komîn bi hemû pêdiviyên şêniyan radibe. Çiqas komîneke aktîf be, ewqasî şêniyên wê komînê birêxistinkirî ne. Di komînan de komîteyên cur bi cur û li gorî pêdiviyên şêniyan hene. Komîteyên tendirustî, xizmetguzarî, parastinê, lihevanîn û hwd. hene.

**Armanc xalîkiria herêmê ye**

Li hember van hemû rêxistinan koçberên Efrînê, hikûmeta Şamê, Rûsya, dewleta tirk û çeteyên wê siyaseteke qirêj û şerekî taybet ê hovane dimeşînin, da ku civakê ji cewherê wê dûr bixin ku bi vegera Efrînê nefikirin û belav bibin. Lê koçberên Efrînê dibêjin rêxistinkirina me li Şehbayê li nêzî kantona Efrînê bi armanca vegera li Efrînê ye. Lê dijmin li hember vê yekê bê çare dimîne, ji lew re hemû siyasetên qirêj û êrîşan pêk tînin, da ku careke din şêniyên Efrînê koçber bikin û belavtir bikin, lê dê berxwedana koçberên Efrînê hemû herêmên dagirkirî vegerîne, bi taybet jî Efrînê.

# Konferansa normalîzekirinê ya li Hewlêrê

Serdem Silo

Gelê kurd li başûrê Kurdistanê salvegera birîna xwe derman dike. Birîn birîna raferandûma 25 Îlona 2017'an e ku di encamê de başûrê Kurdistanê nêzî ji sedî 51'ê erdnîgariya xwe winda kir û rûpelekî nû bi Bexdayê re vekir. Her wiha der barê hilbijartinên ku tên payîn di 10'ê cotmeha bê de bêne lidarxistin, kanaleke Israîlê di vê dema hesas de encamnameya konferansa 'Vegerandin û Aştî'yê weşand û tê de hate gotin ku 'iraqî dixwazin têkiliyên xwe bi Israîlê re normalîze bikin.'

Navenda Pêwendiyên Aştiyê ku li New Yorkê ye konferansek di bin navê 'Konferansa Aştî û Vegerandinê' de di 24'ê vê îlonê de li paytexta başûrê Kurdistanê bajarê Hewlêrê organîze kir. Di konferansê de bêhtirî 300 kesayetên siyasî yên ıraqê; ji sunnî û şî û efserên berê û kesayetên eşîran beşdar bûn.

Damezirînerê 'Navenda Pêwendiyên Aştiyê' Joseph Broad ku sponsoriya konferansê dikir got ku beşdar ji 6 parêzgehan (Bexda, Mûsil, Selaheddîn, Enbar, Diyalî û Babil) li Hewlêrê kom bûn.

Li gorî Kanal 12 ya Israîlê piraniya welatiyên Iraqê dixwazin têkiliyên xwe bi Israîlê re normalîze bikin. Piştî ku nûçe di dezgehên ragihandinê de belav bû, kesayet, partî û hevbendî û heta hikûmeta Iraqê û parlemantoya Iraqê jî li pey hev daxuyaniyên şermezarkirina vê konferansê dan û beşdarên vê konferansê weke xayîn bi nav kirin.

Dadgeha Bilind a di nav de Wîsam El-Herdan (Fermandarê El-Sehewat li Iraqê) jî hebû, li Iraqê fermana girtina kesên beşdar da û daxuyaniya daxwaza normalîzekirina têkiliyan xwend. Her wiha karmenda wezareta çandê Seher Kerîm El-Taî ya ku di birêvebirina konferansê de dixebitî û hin kesên din jî tev di nav de hebûn.

Fermana girtinê her wiha parlamanterê berê Mîsal El-Alûsî jî digire nava xwe. Ew beşdarî konferansê nebûbû lê ew yek ji wan kesan e ku piştî dagirkeriya Amerîkayê ya di sala 2003'an de 'Iraqa nû' ava kir û piştî ku gelek serdan li Til Evîvê re kirin ew bi dilgermî dixwaze têkiliyên bi Israîlê re normalîze bibin.



Nakokiyên di navbera herêma Kurdistanê û Bexdayê de hê jî bi dawî nebûne û berdewam in. Di wê demê de ku kurd û giştî welatiyên Iraqê amadekariyên lidarxistina hilbijartinên pêşwext ên parlemantoyê dikin, da ku bibe rûpeleke nû di nava her du aliyan de, li Hewlêrê konferansa 'normalîzekirinê' hate lidarxistin û vê yekê hişt ku alozî ji berê girantir bibe. Welatiyên Iraqê jî Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK (û desthilatiya li başûrê Kurdistanê weke xayîn bi nav dikin.

Lidarxistina konferansê beriya hilbijartinan bi hefteyekê pêk hat û bi taybet welatiyên kurd dixwazin bi riya van hilbijartinan vegerin herêmên madeya 140'î ya destûra Iraqê (herêmên bi nakok). Li ser asta leşkerî jî di navbera Bexda û Hewlêrê de lihevkirinên leşkerî pêk hatin ku li van herêman rê li ber vegera pêşmergeyan vedike. Lê ji ber vê konferansa hatiye lidarxistin têkiliyên di navbera Bexda û Hewlêrê de vegeriya xala sifirê, bi taybet komên alîgirên Îranê naxwazin pêşmerge vegerin.

Konferansa 'normalîzekirinê' ku li Hewlêrê hatiye lidarxistin dê heta asteke bilind bandorê li encamên hilbijartinan bike. Nexasim li herêmên girêdayî madeya 140'î ya destûra Iraqê dê bandor bike. Hêzên kurdistanî li van herêman ji 20 namzetan bêhtir in. Her wiha serweriya kurdan li van herêman weke beriya 2017'an tune ye.

Ev konferans ji aliyê PDK'ê ve weke diyariyeke li ser sêniyeke zêrîn pêşkêşî kom, partî û hevbendiyên alîgiriya Îranê dikin, hate kirin. Bi taybet herêmên girêdayî madeya 140'î ya destûra Iraqê hatin pêşkêşkirin. Nemaze ev kom li van herêman serwer in. Dibe ji ber vê mijarê aloziya têkiliyan di navbera kurdan û hêzên şîî de li Iraqê dijwartir bibe. Her wiha ev rewş ji partî û hevbendiyên alîgirên Îranê re veguherî derfetekê da ku propagandaya xwe ya siyasî di van hilbijartinên bê de bikin.

Çavdêr difikirin ku PDK bi hembêzkirina konferansên wiha hin deverên din ên başûrê Kurdistanê winda bike, ji ber ku welatiyên Iraqê gelekî hesas li mijara normalîzekirina têkliyan bi Israîlê re dibînin. Welat niha di nav 'şerê bilokan' de ye. Ji ber wê jî doza têkliyên bi Israîlê re yan jî şerê li dijî wê wekî dozeke navendî tê dîtin û gelek alî di vê mijarê de jî bi nakok in.

# PDK'yê doza sîxuriyê li Cîhad Hesen kir

Nûnerê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yê li bajarê Hewlêrê Cîhad Hesen der barê girtin û îşkenceya ku lê hatiye kirin de axivî û diyar kir ku hêzên PDK'ê doza sixuriyê lê kirin

Navenda Nûçeyan



Nûnerê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yê bajarê Hewlêrê Cîhad Hesen di 10'ê hezîranê de ji aliyê hêzên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ve hatibû revandin. PDK'yê piştî 112 rojan Cîhad Hesen di 29'ê îlonê de serbest berda. Piştî ku Hesen hat berdan li Hewlêrê hat dersînorkirin û di deriyê Sêmalka de derbasî rojavayê Kurdistanê bû.

Cîhad Hesen têkildarî girtin û dersînorkirina xwe de bi Ajansa Mezopotamyayê re axivî û diyar kir ku sîxurtiyê lê kirine.

Hesen bi bîr xist ku ev 6 sal in li herêma Başûr wek nûnerê Rêveberiya Xweser kar û barên xwe berdewam dike û roja ku hatiye revandin jî ew ji bo pêşwazîkirina şandeya ji Fransayê dihat çûye Balafirgeha Hewlêrê û wiha got: "Piştî ku me şande pêşwazî kir, 4 maşîneyên zirxî derdora me girtin. Du wesayîtên me hebûn. Van kesên em dorpêç kirin, berê çekên xwe dan ser me. Me ji wesayîtan daxistin. Min wê kêliyê got herhal xeletiyek heye. Pişt re gotin em ê we bibin. Me texmîn nedikir tiştek wiha bibe. Ez kesekî siyasetmedar im û sivîl im, lê ji bo binçavkirinê yekîneyeke taybet hatibû wezîfedarkirin."

**Dema binçavkirinê**

Cîhad Hesen da zanîn ku yekîneyên taybet ji wan xwestine, şandeyên biyanî yên ku tên, radestî wan bikin û ev tişt anî ziman: "Piştî heyeta ku me pêşwaziya wê kiriye dê 4 mêvanên me yê din jî bihatana û yekîneyên taybet ji me xwestin ku em van 4 kesên din teslîmî wan bikin. Ez li hemberî vê yekê bi awayekî tund sekinîm û min got bi tu awayî ez bi gotina we nakim. Dema me daxwaza wan red kir, em binçav kirin û gotin ku heta 4 mehan jî em we bernadin. Min di destpêkê de bawer nedikir û min got qey ji bo zexta psîkolojîk vê yekê dikin û dibêjin."

**Teklîfa sîxuriyê**

Hesen diyar kir ku ew ji bo hevdîtinên dîplomatîk gelek caran çûye Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û wiha domand: "Di bin çavan de sedemên çûn û hatina min a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî pirsîn. Yekîneya taybet teklîfa sîxuriyê li min kir. Wan ji min re pêşniyaz dikir ku ez bi wan re bixebitim. Min ev yek red kir. Piştî wê, dest bi gotinên wek 'hûn li hemberî rêveberiya Başûr di nav kiryarên xirabkar de ne' kirin. Dema min sedema van gotinên wan pirsî jî şandeya biyanî nîşan kirin û gotin 'hûnê bi van re vê yekê bikin.' Min jî got her tiştê me di çarçoveyeke fermî de ye."

**'Kîs xistin serê me'**

Di berdewama axaftina xwe de Cîhad Hesen diyar kir ku yekîneya taybet piştre ew radestî hêzên asayîşê kirine û wiha got: "Tîmeke taybet a ku bi çeken giran bûn û rûyê wan girtî bû, destê me ji paş ve girêdan, kîs xistin serê me û em xistin pêşiya wesayîtê. Mîna ku wan komek 'terorîst' girtibe nêzîkî me bûn. Niha nikarim qala wan tiştên ku li me kirine bikim. Wan em birin avahiya ewlehiya giştî. Cihê ku wan em lê danîn cihekî pir xerab bû. Li wir îşkence û kuştina mirovan rehet bû. Em dîplomatên kurdistanî bûn, ez bi fermî 6 salan li wir bûm. Me tu carî tiştek nekir ku ew rabûn heqê tiştine din li me kirin."

**'Derman nedane min'**

Hesen anî ziman ku pirsgirêkên wî yên tendirustiyê roj bi roj zêde dibûn û wiha got: "Wan li wir ez birim cem bijîşk, derman dan wan kesên ku serê wan diêşe; min xwîn avêt, ez ketim erdê, lê wan derman nedan min. Hewl dan ku rewşa tendirustiya min bi kar bînin. Doktoran ew hişyar kirin ku dermanan nedin min. Di dawiya 3-4 rojan de dema ku dîtin ez xwînê diavêjim derman dan, lê dîsa jî dermanên ku min dixwestin nedan."



# Hilbijartinên Iraqê

Navenda Nûçeyan

Di 10'ê cotmeha 2021'ê de li Iraqê hilbijartinên pêşwext pêk tên. Ji sala 2005'an vir ve dê ev bibe hilbijartinên pêncemîn. Di encama xwepêşandanên mezin ên sala 2019'an de û li ser daxwaza gel dawî li hikûmeta serokwezîr Adil Abdulmehdî hat û li şûna wî Mustafa Kazimî bû serokwezîr.

Bi nêzîkbûna hilbijartinan re germahî û kelecana hêzên siyasî yên ku serkêşiya xwepêşandanan dikirin kêm bû û hêviya wan a guhertinê jî pê re kêm bû, heta hin aliyan banga boykotkirina hilbijartinan kir.

Li gorî daxuyaniya saziyên fermî yên dewletê rêjeya tevlibûna di hilbijartinên 2018'an de gihabû ji sedî 40'î lê li gorî çavdêrên siyasî ew hejmar ne rast e û rêjeya rast a tevlêbûnê negihabû ji sedî 20'î. Her wiha li gorî çavdêrên siyasî dibe ku rêjeya tevlibûna hilbijartinan vê carê kêmtir be jî.

Hêjayî gotinê ye ku di encama xwepêşandanên 2019'an de derdora 600 kesî hatin kuştin, bi hezaran birîndar bûn û gelek kes hatin girtin û binçavkirin û hinek çalakger jî reviyan başûrê Kurdistanê an jî derveyî welat.

Gelek hêzên sivîl û lîberal bi taybetî yên ciwanên ku roleke mezin di xwepêşandanan de lîstibûn û dikaribûn dawî li hikûmeta Adil Abdulmehdî bînin, van hilbijartinan boykot dikin.

Yek ji wan hêzên berbiçav partiya 'Mala Neteweyî' ye. Serokê vê partiyê Hisên Xezalî di daxuyaniyeke çapemeniyê de wiha dibêje: "Em banga xwepêşandan û tevgerên tundiyê nakin di dema pêkanîna hilbijartinan de ji ber ku em zarokên demokrasiyê ne. Tu ewlekariya van hilbijartinan tune ye ji ber ku ew di rewşeke wiha de pêk tên ku çalakvanên siyasî tên koçberkirin û di bin siya çekan de pêk tên."

Her wiha serokê partiya Komonîst a Iraqê Raîd Fehmî jî der barê hilbijartinan de wiha got: " Ev hilbijartinên pêşwext li ser daxwaza xwepêşandêran pêk hat, ji ber ku wan daxwaza guhertinê dikir lê rewşa ku ev hilbijartin dê tê de pêk werin tu hêviyên guhertinê nade û tu krîzên heyî çareser nake."

Wiha tê texmînkirin ku hikûmeteke li gorî lihevkirinên aliyên siyasî were avakirin ku ji heman aliyên siyasî ên berê pêk tê û ew yek nabe bersiv ji bo daxwazên guhertinê yên xwepêşandêrên iraqî ku bi milyonan daketibûn kolanan.

## Destwerdana milîsên Îranê

Hilbijartinên Iraqê yên ku dê di bin siya çekan de pêk werin û encamên ku bi xwe re bîne dê rewşa Iraqê ya piştî hilbijartinan destnîşan bike. An wê milîsên çekdar di rûyê hev de çekan bi kar bînin an jî dê xenîmetan di nava hev de parve bikin. Niha rikeberiya bingehîn di navbera komên alîgirên Îranê û Muqteda El Sedir de ye ku ew jî şîî ne û li dijî hemû destwerdan û hebûnên biyanî ne. Der barê vê mijarê de berpirsekî Sedir ku nexwest navê xwe aşkera bike wiha got: "Em di wê metirsiyê de ne ku heke em serkeftineke mezin di hilbijartinan de bidest bixin dê ew yek bibe sedema tundî û pevçûnan, ji ber dê alîgirên Îranê wê yekê qebûl nekin."



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Erdogan û Pûtîn bêyî hev nikarin bikin

29'ê meha îlonê roja çarşemê Serokê Rûsyayê Vladimîr Pûtîn û Serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayyip Erdogan li bajarê Soçiyê li hev civiyan. Piştî serdana Erdogan ya Amerîkayê ev hevdîtin û çawaniya hevdîtinê ji aliyê gelek kesan ve dihat meraqkirin. Hevdîtinê nêzî 3 saetan dewam kir. Di vê hevdîtinê de mijarên hatin destgirtin, nêzîkatiya aliyan ji hevdîtinê re û piştî civînê nedayina daxuyaniya çapemeniyê ji gelek aliyan ve tê nirxandin.

Divê em bizanibin ku li herêmê pêdiviya Rûsya û Tirkiyeyê bi hev heye. Her çendî di navbera wan de hin nakokî hebin jî ev nayê wateya ku wê ev nakokî li ser têkiliyên wan ên stratejîk bandoreke neyînî çêbike. Lewma mirov dikare van nakokiyên ku niha derketine wek nakokî ango wek nelihevkirina demkî bibîne û binirxîne. Lê ger ev nakokî kûrtir bibin wê demê dibe ku li herêmê li ser hin pêşveçûnên siyasî jî bandora wê hebin.

Erdogan di pêvajoya desthilatdariya xwe de hertim hewil da ku bi têgeha pan-turkîzm, neo-osmanî û pan-îslamîzmê çar aliyên cîhanê li gor berjewendiyên xwe bi kar bîne û bi vî awayî xwe bike hêz. Bi vê nêzîkatiyê Tirkiye ji Sûriyeyê heya Qerabaxê û gelek cihên din xwe li ser hin aliyên siyasî ferz dike. Yek ji van aliyan jî Rûsya ye.

Dewleta tirk di vê siyaseta xwe ya kirêt de hewil dide xwe li herêmê bi cih bike. Lê divê em bizanibin ku dewleta tirk ji roja hatiye avakirin heya roja me, hertim alîgir û hevalbendekî welatên rojavayî bûye. Lewma nêzîkatiyên wê yên xwe wek hevalbendên rûsan didin nîşandan jî heya astekê derbasdar in. Her çendî ev hevdîtin li gor kevneşopiya dewletê tên lidarxistin û li gor xwe hin wateyan didinê jî di hin mijaran de nikarin bibin yek.

Di heman demê de, di mijara peywendiyên di navbera Rûsya û Sûriyeyê de jî pirsgirêka sereke dewleta tirk e. Bi herêmên dagir kiriye, piştgiriya dide komên çeteyan û kûrkirina krîza li herêmê ya ku Tirkiye tê de xwedî rolekî sereke ye. Ev ji aliyê Rûsyayê ve baş tê dîtin. Bêguman Rûsya jî li gor berjewendiyên xwe nêzî mijarê dibe. Lê diyar e ku ji bo Moskovayê, Şam ji Enqereyê nêztir e.

Rûsya hewil dide ku li herêmê destê rejîma Esad xurt bike. Ji bo dawî li krîza heyî bê anîn pêdiviya Rûsyayê bi rêvebiriyeke xurt a Şamê heye. Li qadê, yên li pêşiya vê helwesta Rûsyayê dibe asteng jî dewleta tirk û komên wê yên çeteyan e. Rûsya êdî di ferqa vê de ye.

Jixwe Erdogan bi awayekî aşkera got ku: "Aramiya Sûriyeyê bi têkiliyên Rûsya û Tirkiyeyê ve girêdayî ye" ev ji nirxandinê wêdetir lixwemikurhatinek e ku çendî aramiya herêmê têk birine.

Wekî din mijarên siyaseta derve ya rûs-tirkan tenê bi Sûriye û Qerebaxê re sînordar namînin. Afganistan jî wek mijareke sereke derdikeve pêş. Wê di demeke nêz de hilbijartin li Lîbyayê bêne kirin. Encama van hilbijartinan her du welatan jî ji nêz ve eleqedar dike. Di mijara jinûveavakirina Lîbyayê de her du welat bi hev re di nav pêşbaziyekê de ne. Rûsya û Tirkiye ji bo di bazara ku ji Afrîkayê re vedibe li qadê destê hev lawaz bikin kozên xwe bi kar tînin.

Welatên Rojavayî jî ji bo pêşveçûna Rûsyayê ya di qada navneteweyî de lawaz bikin, Tirkiyeyê bi kar tînin. Ji ber ku Tirkiye endamê NATO'yê ye, li gor siyaseta NATO'yê ya global tevdigere. Her çendî bi kirîna fûzeyên S-400 ji vê nêrînê hinekî dûr ketibe jî di bingeha xwe de dewleta tirk ne di wê hêzê de ye ku bi temamî NATO'yê bide hemberî xwe. Bi vê mijarê ve girêdayî mirov dikare helwesta Amerîkayê wek helwesta NATO'yê bibîne.

Ji 'hevdîtina Erdogan û Pûtîn di çi astê de derbas bû', 'wek encam çi derket' zêdetir, ji niha û şûn ve wê stratejiya her du welatan çi be ew girîng e. Wek me li jor jî got ne Erdogan dikare bê Pûtîn bimîne ne jî Pûtîn dikare bê Erdogan bimîne. Ji ber ku pêwîstiya her duyan bi hev heye, her çendî di hin mijaran de dijberî hev bin jî mijarên wan nêzî hev in û ji hevûdu ne kêm in.


# 'Azadî ji zarokatiyê ve dest pê dike'

Huseyin Çatikkaş

*Ji bo bîranîna hemû zarokên kurd ku ji aliyê dagirkeran ve hatine kuştin...*

Di Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî de 54 xal ji bo parastin û mafên zarokan hatine destnîşankirin. Helbet kesên bixwazin dikarin van xalan li ser rûpelên înternetê bixwînin û hîn bibin. Lê divê em bipirsin ku gelo zanîna van xalan têra maf û parastina zarokan dike? Heke ev xal têrê nekin, çima ji aliyê gelek dewletan ve hatine destnîşankirin? Werhasil mirov dikare van pirsan zêde bike, lê hewce nake. Yek ji van xalan wiha ye: 'Mafê jiyan û pêşveçûnê'. Ev xal destnîşan dike ku 'mafê hemû zarokan ji bo jiyaneke bitendirust, mezinbûn û pêşveçûnê heye.' Mixabin li Kurdistanê ev maf ji aliyên hêzên dewletê ve ji zarokan tê wergirtin. Li Kurdistanê zarok her gav rastî tundiya dewletê ya psîkolojîk û fîzîkî jî di nav de tên. Lê ser van her du cureyên tundiyê gelek caran nivîs tên nivîsandin an jî daxuyanî tên dayîn. Lewma her du cureyên tundiyê piçekî tên nasîn.

Amûrên dewletê yên kujer li her kolanên Kurdistanê êrîşî kurdan dikin, kî bikeve pêşiya wan tenezul nakin, didin ser wan û derbas dibin. Dewletê Kurdistan bi amûrên xwe yên şer dagirtiye, bêyî ku pakiyê ji kesan re bike an jî şerm bike roja dîtir kujerên xwe dîsa bi heman wesayîtê dişîne heman kolanê. Wesayîtê zirxî/kujer ên dewleta dagirker ev demeke dirêj e, di bin navê qezayan de zarok û kal-pîran dikuje. Li gorî daneyên Komaleya Mafê Mirovan a Şaxa Amedê di navbera salên 2008-2021'ê de 76 bûyerên qezayên bi wesayîtên zirxî pêk hatine û di van qezayan de 20 jê zarok 42 kes mirine. Dîsa di van bûyeran de 21 jê zarok 90 kes jî birîndar bûne. Ev bûyer hemû li bakurê Kurdistanê qewimîne. Li gorî van daneyan wesayîtên zirxî yên dewletê ji bo kuştina mirovan li nav bajar û



kolanên Kurdistanê digerin. Di heman demê de ev kuştin helwesta dewletê ya li hemberî kurdan nîşan dide. Ji ber vê yekê ye ku hiqûqa dewleta dagirker jî bêyî ku ajokarên van wesayîtên zirxî/kujer ceza bike, wan dîsa dişîne nav kolan û bajarên me.

Lê ka helwesta me ya li hemberî dagirkeran çi ye? Zarok, bêguman li ser rûye dinyayê mirovên herî pak û dilpak in. Lewma kuştin an jî tundiya li ser zarokan li kîjan devera dinyayê be, hemû mirovên xwedî wijdan aciz dike û dilên wan diêşîne. Îstîsnayeke vê yekê heye. Ev îstîsna bêguman Kurdistan e ku her car zarok tên kuştin û marûzê tundiya dewletên dagirker tên. Fanonê ku li hemberî dagirkeriya Fransayê ya li Cezayîrê têkoşîn meşandiye wiha dibêje: "Dagirkerî tundiya tazî ye." Tundiya dagirkeran her roj li Kurdistanê bi awayekî cuda xwe nîşanî me dide. Dagirker dixwazin ku em bi rêya tundiya wan her gav hîs bikin û wan ji bîr nekin da ku em nebêjin wan rêya we şaş e. Bi rêya tundiyê xwe li ser civakê didin ferz kirin.

Helbet weke Fanon dibêje dagirkerî bi xwe tundî ye lê dagirkerên Kurdistanê bi rêbazên cuda yên tundî û polîtîkayên cuda her kêlîkê xwe berbiçav dikin. Lewra li serê her kolanê amûrên xwe yên şerên taybet bi cih kirine. Alayên xwe li deverên herî bilind û herî mezin û her sûkê daliqandine. Kolan û sikakê Kurdistanê bi kamerayan tijî kirine. Weke 'Biraderê Mezin' ê George Orwell li her derî çavên dagirkeriyê hene. Tevî van hemûyan li kolan û cadeyan wesayîtên wan ên zirxî bênavber û sekan digerin. Ji ber ku dixwazin em hînî wan bibin. Tevî vê jî refleksa me ya li hemberî dagirkeriyê pir qels e. Lewra ew jî ji vê hêzê digirin û tundiya xwe ya li ser gel zêdetir dikin. Kuştina zarokekî kurd bi qasî tiliyên Erdogan ên ku serê zarokekî tirk dayî, deng neda. Helbet refleksa li hemberî Erdogan rast e, lê qey kuştina zarokekî kurd ji vê ne mezintir e? Wijdana civakê li hemberî kuştina zarokên kurd kerr û kor e. Wijdanê me kurdan jî qey fêrî kuştinan bûye ku refleksekê xurt û mezin nîşan nade. Dema em fêrî mirinan bibin, em ê her roj bimirin, lewma weke civak, divê em fêrî kuştinan nebin.

Helbet ev hemû encamên polîtîkayên dewletê yên ewlehî û dagirkeriyê ne. Di bin navê ewlehiyê de kuştina me li cem dewletê rewa û hiqûqî ye. Bi van kuştinan dewlet dixwaze xwe bîne bîra civaka kurd û tirsa xwe li ser gel zêdetir bike. Lewra kuştina her kurdekê/î ji bo dewletê cihê kêfxweşiyê ye. Heman tişt ji bo civaka tirk jî derbasdar e. Polîtîkayên dewleta xwe bêyî ku gumanê jê bikin, qebûl dikin û pîroz dibînin. Lewma wijdana wan ji bo kurdan nalepite. Dema mesele dibe kurd wijdan ji cem wan bar dike, rasterast dewlet û ewlehî tê bîra wan.

Dewleta tirk bi salan Tevgera Azadiya Kurdistanê bi kuştina zarokan sûcdar kir, bêyî ku tiştek wiha hebe jî. Em tenê van daneyên li jor mêzênin jî dewleta tirk kujerê herî mezin yên zarokan e. Bi avabûna dewleta tirk ve heta roja me dewlet li Kurdistanê zarok, jin û kalpîran dikuje. Piştî avabûna netew-dewleta tirk polîtîkayên taybet li ser kurdan hatin meşandin. Ji ber ku dewleta dagirker hemû kurdan dijminê xwe dibîne, rê û rêçikên tunekirina kurdan armanca wê ya sereke ye. Ji ber vê yekê ye ku her tim kujerên xwe parastiye û xelatên mezin daye wan. Navên kujerên kurdan daye kolanên bajarên kurdan, dibistan li ser navên wan li Kurdistanê ava kirine. Lewma leşker û polîsên dewleta dagirker li Kurdistanê bi hêsanî dikarin bi wesayîtên xwe bidin ser zarokekî, kalepîrekî an jî bikevin malan zarokên di xew de bikujin. Di eslê xwe de armanc ne kuştina zarokan e ku dizanin bi kuştinê wê kurd xilas nebin. Armanc ew e ku zarokan çavtirsandî bikin da ku li ber dewletê serî bitewînin. Ew baş dizanin ku kuştina zarokan, kuştina azadiya hemû zarokan e. Ji ber vê divê em zarokên xwe û azadiya wan ji bin postal û lastîkên dagirkeran derînin. Ew jî bi helwesta rast, xurt û mezin pêkan e.

# Tirsa serdestî û bindestiyê

Feyzî Mîrhesen

Tirs di ruhiyeta hemû candaran de heye û xwezayî ye. Ez zêde nakevim warê îlm û zanistê. Lewra ev mijara derûnnas û zanyaran e. Ew bi zanistî van mijaran vedikolin û tespît dikin. Ez ê bi qasî jiyana pratîk û tê de jiyame bikaribim bînim ziman. Gelo tirs û derûniya kesên an jî civakên serdest û bindest wek hev in? Wekî ku di nava civaka me de mezin bûm dixwazim hin dîtinên xwe bînim ziman. Me gotibû tirsa xwezayî û derûnî wek hev in. Mînak ji bo hemû candaran tirsa mirinê, tirsa av, agir û hemû tiştên xwezayî yek e... Di vir de tirsa kesên bindest û derûniya wan çi ye? Tirsa kesên mezin û serdestan ji çi ye? Tirsa zarokan ji çi ye? Mezinên malbatê dema zarokên me bigiriyana ji bo aşkirina wan digotin: "Hiş be filan kes hat wê li te bide." An jî: "Cendirma hatin wê te bibin." Carna jî digotin: "Gur û hirç hatin wê te bixwin." Bi van tiştan em ditirsandin. Mezin jî bi vê yekê hatibûn tirsandin. Mezinên ku bi vê yekê hatibûn tirsandin, zarokên xwe jî bi vî şiklî ditirsandin. Gelek cureyên tirsê hene. Tirsa ji dayîk û bavan, tirsa ji şevên tarî, tirsa ji hin mezinan, tirsa ji 'Xweda' lewra Xweda ji ber ku dilovan e û adil e zêdetir bi awayekî negatîf dane nîşandan.

Tirsa ji qereqolan, tirsa ji malbatên li hemberî hev û tirsa ji afetên xwezayî jî hin şekl û cureyên tirsê ne.

Dîsa gelek tirsên din hene; Tirsa ji kar û xebatan bêne avêtin û birçî bimînin heye. Ev tirs jî bo mêr û jinan e. Lê tirsa jinan di nava civaka me da cuda ye. Tirsa ku bêbextiyek bê sere wê, an jî ji aliyê malbatê ve were terkkirin heye. Jin di civaka me de wek civakên din xwedan ewlehî an jî di bin sîwana parastina dewlet an jî saziyekê de nebûn.

Yên serdest, dema zarokên xwe ditirsînin bang li cendirmeyan nakin û bi cendirmeyan zarokan natirsînin. Ji ber ew bi xwe cendirme nin. Tirsa mezin a kesên desthilatdar ew e ku rojekê karker wan ji desthilatdariyê dûr bixin. Tirsa wan ew e ku karên wan ji destê wan derkeve.

Kesên bindest ji hebûna xwe ya xwezayî û fitrî ditirsiyan û ditirsin. Zimanê wan û kesayeta wan qedexe ye. Ji hebûna xwe ditirsin. Lewra kurd, mamoste, mela, pîr û ezidî ditirse. Bi bi zimanê xwe nikare di mizgeft û cihên baweriyan de biaxive. Ger ku karmendê dewletê be qet nikare biaxive. Du caran ditirse. Yek, tirsa piştî avêtina ji kar dê malbat û zarokên wan birçî bimînin. Dudu jî ji ber ku kurdî axiviye dewlet dê tiştekî bîne serê wan. Ne karmend be jî ji ber ku bi kurdî axiviye ditirse. Bi gotina wan be bi 'zimanekî nayê zanîn' axiviye. Ev jî belayeke mezin e. Heke hunermend û siyasetmedar be, di bernameya tirkî de, di şova Îbrahîm Tatlises de, tenê bikaribe 'bir momik îki momik' bibêje.

Lê Leyla Zana ji ber gotineke kurdî bi salan di zindanê de ma. Lewra dibêje 'Ez wekî her kesî bi zimanê xwe û hebûna xwe ve siyasetê dikim'. Hebûna neteweya xwe diparêze. Me gotibû tirsa xwezayî di her candaran de heye û em kurd jî mirov in. Ev tirs ji bo me jî derbasdar e. Em ji hemû bawerî û bawermendan, rewşenbîr û mirovên adil dipirsin. Gelo ji bilî kurdan neteweyeke navê wî kurd heye? Xwedê dibêje me mirov qewm bi qewm, ziman bi ziman û di dirûvên cuda de afirandiye. Di zagonên mirovayî de jî xal bi xal tîne ziman. Hûn ji bo me çi dibêjin?

Bi hêviya her kes bi maf û hebûna xwe ve bêtirs bijî.





Helîm Barîn

## Mebest

Gotineke pir xerab derdikeve ji devê xortekî, xwe aciz dike, lêborînê dixwaze û dibêje: "Mebesta min ne ew bû, min nedixwest wê bibêjim". Xuya ye zimanê wî qels e û xwe şaş îfade kiriye. Hin kes hene pîvana zimanên wan tune ye, dipeyivin ji xwe re. Lê fam dikî; derd û gotinê wan li hev nekin jî mirov gotinê dibuhure û guh dide derdê wê/wî kesî. Di rewşên wiha de mebest yanî niyet pirî caran ji gotinê bi qîmetir dibe. Erê dibêjin 'rêya dojehê bi niyeta baş tê vekirin'. Erê rast e, bi tena serê xwe bi niyetên baş nikarî tu tiştekî ava bikî lê bi min ruhê gotinê ye mebest. Niyeta baş îmkana diyalogê ye. Carna hin kes dema heqîqêtê jî bi lêv bikin û tu baş pê ewle bî ku niyetxirab e tu tesîra wan gotinan namîne û tu pê re nikarî diyalogekê ava bikî. Ev ji bo hemû qadên jiyanê derbasdar e. Ji welatparêziyê heya neteweperestiyê û ji dîndariyê heya sosyalîzmê hemû îdeolojî encax bi niyetên baş dikarin nîqaşeke erênî ava bikin. Divê ji bo yekitiya kurdan manîfestoya mebestê hebe, her partî û sazî, tevger ji bo her çar parçeyên welêt çi difikirin divê zelal be. Yan na em texmîna dikin lê her gav niyet ewqasî bi zelalî xuya nake. Dema wiha be û tu li ser niyetê bipeyivî tê rexnekirin û di wateya pêş-daraziyê de ji te re dibêjin neytokî. Heya radeyekê rexneyeke rast e jî. Wê gavê pirseke wiha derdikeve: Em ê niyeta mirovan çawa fam bikin?

Bi min li vir têgeha ku em nîqaş bikin êdî dibe hevgirtîbûn. Dema kirin û gotin nebe yek, dema du gotinên me yên cuda li hev nekin, dema uslûb ne li gorî naverokê be wê demê mirov dipirse ka derdê wê/î çi ye? Bi mînakan em berdewam bikin. Heger yek rabe û bibe hevalê dewleta mêtînger dû re jî dev biavêje slogana "biratiya gelan", ma ev çi rewş e? Dîsa tu dibînî serokekî kurd şerê kurd û kurd heram kiriye lê li aliyekî din wek xaliya sor rabixin rê çê dikin bo tankên mêtîngeran li çiyayên Kurdistanê netengijin. Em ê wê gotina xweş bi vê kiryara bişik çawa li hev bînin? Mînakeke teze; tu bi xebatên salan û bi berdelên giran di van şert û mercên faşîzmê de li Bakur bi îdiaya parastin û pêşxistina çand û hunera kurdî komeleyekê vekî û ji Ewropayê yek rabe beriya ku pîroz bike, ji ber ku navê fermî tirkî ye rexne bike; a li wir pirs çêdibe ? Ji ber wê jî bo mafdarî ew ê mebest bê pirsîn. Dîsa mînakeke balkêş; 9 sal berê bû, îmkana aştiyê hebû. Nûçeyan behsa agirbesta dualî dikir. Li civatekê min digot dinya alem giş bi vî awayî çareser kirine. Lê yekî rabû, manîfestoya netewperestiya Kurdistanê pêşkêş kir. Di ser de jî hemû hevdîtinên bi dewletê re wek sûc şîrove kir û got wer nabe, îlim dewlet. Ser sera ser çavan lê heyran çima du saetên din tu behsa serlêdana xwe ya gardiyaniyê dikî. Camêrê min û te dikare hem ji dewleta mêtînger re gardiyaniyê bike û hem jî doza welêt ji kesî re nehêle. Ger di rexneyên xwe de niyetxerab nebe bi vê nakokiyê çawa dikare bijî?

Helbet nakokî heya cihekî însanî ye. Nakokiyên me hene. Lê mirov her xwestiye ji nakokiyên xwe xelas bibe. Nakokiyên hundurîn krîzên bûnewerî ne û mirov xwe û kesayeta xwe bi şerê bi wan krîzan re ava dike. Di van şeran de bi ser kevî, kirin û gotin li hev dikin û dibî yeka/ê "lihevhatî" lê nakokî xurt bûn û tu di şerê xwe de bi ser nekevî jî tu ji nakokiyên xwe aciz bî, şerm bikî ev jî dike ku tu bibî yekî/e maqûl. Lê nakokî wek alaya kesayetiya te li meydanê be û tu wek ew tune be tevbigerî tu dibî yekî/e lihevnehatî.

# Psîkolojîyê rayedaran xeripîya

Helîn Uzel



Tarîx destpêkê aşma Teşrîna Verêne nawit. Serewedaritişê 6-8ê Teşrîna Verêne ya 2014î heme xeyalanê xelîfatîye ê çeteyanê DAIŞî û Serokkomarê tirkî Tayyîp Erdoganî sero bin kerd. Çeteyanê DAIŞî serra 2014î de Şengalî ra dima, seba qirkerdişî verê xo dayî bajarê Kobanê û dest bi hêrişan kerdî. Xêncê taxêka qicek, pêroyê Kobanê binê îşgalê çeteyanê DAIŞî de bî. Dewleta tirke hêvî kerde ke aye taxe de zî xoverdayîş têk şêro û Kobanê de qirkerdişêko pîl pêk bêro û bi no awayî serkewtişê xo yê bi hemkarîya çeteyanê DAIŞî îlan bikera. Eynî wextî de lejvanê YPG û YPJyî bado ke sivîlan dewan ra vetî û berdî cayanê asayîyan, verva çeteyan dest xoverdayîşê destanî pê ard.

Lejvanan bi tifinganê ferdî û îmkananê kêmî cewab da hêrişan û vera hovîtîya çeteyan de welatê xo pawit. Verva naye Erdoganî paştîdayîşê xo yê seba çeteyan dahana zêdina û vernî de 5ê Teşrîna Verêne de PYDyî zêy terorîst îlan kerd û bi vatişê "Kobanê ha kewt, ha keweno" hetgiranê xo geş kerd û seba ke şarê kurd Kobanê de binê faşîzm û tarîtîya çeteyanê DAIŞî de bo kêfweşîya xo ard ziwan. Nêy vatişanê Erdoganî seba şarê kurd vatişê peyên bi û êdî sabrê kurdan nêmend. Roja 6ê Teşrîna Verêne de vakurê Kurdistanî de serewedaritişêko tarîxî dest pêkerd û heme hesabê qilêrinî ê dewleta tirke û çeteyanê DAIŞî sero bin bî. Vakurê Kurdistanî de bi se hezaran kesî bi sloganê "Her ca Kobanê yo, her ca xoverdayîş o" vejîyayî kuçeyan. No serewedaritiş wextêko zaf kilm de hemeyê Tirkîya û Ewropa ra vila bî. Her cayî de têgêrayîşêko heta nika qet ke nêameyo dîyîş dest pêkerd û şar heme cayî de seba paştîdayîşê Xoverdayîşê Kobanê û lejvananê YPG û YPJyî çalakîyan darvist.

Vakurê Kurdistanî de hêzê dewlete û komanê nijadperest-paramîlîterî hêrişê şarî kerdî, labelê reyna zî ser nêkewtê. Serewedaritişê 6-8ê Teşrîna Verêne de Cizîra Botane ra heta metropolanê Tirkîya bi desan bajaran de çalakîyê girseyî pê ameyî. Vakurê Kurdistanî de awanîyê dewlete ê fermî û wesayîtî ameyî veşnayîş. Şarê Nisêbîn û Cizîra Botanî xo ro sînor qelebna û derbazê Rojawanî bî. Hukmatê AKPyî zî zêy çeteyanê DAIŞî verva kurdan dest bi komkiştişan kerd. Goreyê zanayîşan zafêrî 40 kesî cuwîya xo vînî kerd û bi seyan kesî dirbetin bîyî û reyna bi seyan kesî ameyî binçimkerdene.

Bajarê Çewlîgî de rejîmê tirke serre ro provokasyonan da û 9ê Teşrîna Verêne de 2 polîsê xo kiştê û seba ke suco ke kerd bierzo şarî ser 4 welatîyan qetil kerd. La şarê kurd çonk nêna ro û xoverdayîşê xo berz kerd. Serewedaritişê şarî û xoverdayîşê Kobanê tersêko pîl vist zerrîya rejîmê tirke. Rejîmê tirke nêverda seba Kobanê korîdorêke bêro akerdene û heme hedkarîyê ke do sînorî ra biameyênê şirawitene, asteng kerd.

Badê serewedaritişê 6-8ê Teşrîna Verêne xoverdayîş zafêrî berz bî. Kobanê nêkewt û xoverdayîşî ser saet, roj, hewteyî, aşmî û serrî derbas bîyî. Înan ke paweyê kewtişê Kobanê bî, bi xo kewtê û xeyalê înan qirika înan de mend. Her ke xoverdayîş berz bî, ro qada mîyanneteweyî de zî tesîrêk global ame kerdene. Hemeyê dinya bi vengê Kobanê hesîya û no xoverdayîş çar parçeyê Kurdistanî û dinya ro vila bî. Xoverdayîşê Kobanê û serewedaritişê 6-8ê Teşrîna Verêne tarîxê şarê kurdî de ripelêko newe û rayirê dîplomasî akerd. Hêzê mîyanneteweyî (hêzê koalîsyonî) ke verva hêrişê Kobanê de bêveng bîyî, bi saya serewedaritişê 19ê Teşrîna Verêne raya yewine mecbur mendê ke hawayî ra bi desan konteynirî bi çek, cebilxane û malzemeyanê tibbî bişirawê Kobanê.

Xoverdayîşê Kobanê rayîr seba serewedaritişê 6-8ê Teşrîna Verêne akerd û no serewedaritiş qederê Kobanê vurna. Çeteyanê DAIŞî raya yewine Kobanê de têk şî. 7 serrî ra dima zî tesîrê xoverdayîşê Kobanê û serewedaritişê 6-8ê Teşrîna Verêne dinya sero esto. Rayedarê dewleta tirke ke psîkolojîyê înan xeripîya, têkşîyayîşî ra dima plananê qetlîyamanê neweyan viraşt û ewro hama zî dewam keno. Mînaka naye zî sucê şerrî ke herêmanê Zap, Metîna û Avaşînî de pê ameyê yî. Artêşa tirke destpêka serra 2021î ra verva şarê kurdî û lejvananê azadîye de gazo kîmyewî bi kar ana. Nizdîyê yew aşmî yo ke gazo kîmyewî ê neweye ke zafêrî xidaro, bi kar ana. Eşkerayo ke Amerîka, Yewîya Ewropa (NY) û NATO naye zanê, çimkê ê ke paştîdayîşê teknîkî danê Tirkîya ê bi xo yê. Nêy hêzan zî şirîkê nêy sucê verva medimayîye yê û ganî bizanê ke zêy xoverdayîşê Kobanê û serewedaritişê 6-8ê Teşrîna Verêne do xoverdayîşê ewladanê şarê kurdî yo verva faşîzm û qetilkerdişan bêmaben dewam bikero.



# Dewaya vera tîma suîkastî ameye taloqkerdene

Ronîştişo verên ê dewaya ke vera xîretê suîkastî yê serê Hemserekê KONGRA-GELÎ Remzî Kartal û Endamê Konseya Rayberdişî yê KCKyî Zubeyr Aydarî ameye akerdene 1ê teşrîna verêne roja îne ame vînayene.

Ronîştişo ke Mehkemeya Ceza ya Brukselî de ame vînayene, di terefan zî wext waşt. Ronîştiş ame taloqkerdene. Avûkatê hetê kurdan Jan Fermonî vat: ''Na çarçewe de bi taybetî argumanê nuştekî do bêrê girewtene.''

Ronîştiş taloqê 11ê adare ame kerdene. La aşma teşrîna peyêne de pawitişî do dest pêbikerê. Fermonî bi taybetî bale ant tewirê dozgerî ser û vat: ''Dozger destpêkî ra nata îdîa keno ke delîlê qîmî çin ê. Mehkeme zî qebul kerd ke îdîayê dozgerî raşt nîyê.''

Fermonî qirkerdişê 3 ciniyan ê kurdan ê Parisî vist vîrî û vat: ''Ma Fransa de dî ke nê dewayan de neticegirewtiş zehmet o. Ma hêvîdar ê ke Belçîka do heman tewirî nêmojna.'' ***BRUKSEL***

# Makîneyê karî çimeyan kenenê

Koy û birrê Dêrsimî pê bahaneya 'herêma asayîye' yenê qedexekerdene, daristanî yenê vêşnayene, heywanî binê nameyê 'seydwanîye' de yenê qetilkerdene, pê HES, projeyanê madenan cografyaya ci yena xerakerdene.

Qezaya Pilurî ya Dêrsimî de rixmo ke Heyetê Pawitişî yê Erziromî Çimeyê Munzurî sey 'Warê SÎTÎ' îlan kerdbi, Çimeyanê Munzurî de 10ê tebaxa 2020î de rixmê nêrazîbîyayîşanê şar û dezgehanê ekolojî xebata peyzajî dîyabî destpêkerdene. Dima ke dewa amebî akerdene îhaleyê peyzajî hetê mehkeme ra amebî betalkerdene.

La hêrişê vera xozaya Dêrsimî dewam kenê. Çimeyanê Munzurî ke semedê elewîyanê Raya Heqîye fîraz ê de makîneyê karî yê kesayetanê taybetan tede xebate kenê û erd kenenê. ***DÊRSIM***



## Dewey Ma



Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

# Erd

Leze kerdêne ke karî ra vejîyo. Tam wexto ke bikewo teber mişterîyêk bîn ame û ci henî eweqna. Rojbîyayîşê torinê ci bî, waştêne verî dikanê pêkaydoxanê tûtan bêro girewtiş şêro ewca û heşêk qickek torinê xo rê bigîro. Torinê ci heşan ra zehf hes kerdêne. Axir ê o miştêrî zî şirawit û zey vayê vakurî leze kewt teber. Resa dikan û heşêk bi rengê qehweyî weçîna. Pere da û kewt teber.

Verî ke bireso nizdîyê keyeyî di kuçeyê wetî de polîsan ewnayêne kîmlikanê merdiman ra. Ê emir derbas kerd bî, derencayê 65'î zî pey xo verdaybî. La ga ê ra vajê çi? Ewnayî kîmlikê ê ra zî û polîsê por gewrî ci rê va:

- Xalo, heniyan der heqê to de îfade dayî, gere ma şêrî qereqol.

- Memûr beg, xêr o, îfadeyê çi, mesela çi ya?

- Ez nêzana, ewca ra ma go to berê verê sawcî, îfadeyê xo ti go bidê.

Mecbûr... La ga beşko vajo çi. Şanê şemî bî. Ew berd qereqol û a şewe qereqol de mend. Serê sibayî gere vejo verê sawcî û îfade bido. Hendî sawcî vera do, yan bişrawo hepisxane qet nêzano. Heşê destê ci zî te ra girewtî. Tewr zehf zî ene çî zorê ci şîyêne. Qeybî torinê xo girewtbî û enka nêeşkayêne aye heşe bero bido torinê xo, nêeşkayêne şêro şahiya rojbîyayîşê torinê xo. Wexto ke qereqol de hame serê xo, polîsê nobedarî ra rica kerd:

- Tûtê mi hîvî mi bî, zehmet nêbo ez eşkena telefonê înan bikera û xebere bida înan.

Destûr da ci, dest eşt telefonî, lajê ci kerd a û va:

- Ez ameyne keye, rayîr de polîsan ewnayî kîmlikan ro û ez arda qereqol. Ez qereqolê ... de wa. Mi va wa xereba şima te ra bibo.

- Mesela çi ya? Neyse, ez ha yena.

- Nê nê, meye, şima rojbîyayîşê tûte pîroz bikerê. Mi ci rê heşe girewtbî, ha nêbî qismet. Çîke cidî çinîyo, serê sibay go mi berê verê sawcî qeybî îfade. La îla şima wazenê bêrê wa birayê to bêro. Şima pîrozbahî bikerêne. Tûte ra zî vajê kalê to piçeke nêweş bî coka nêşeka bêro, la to rê heşêke weşik girewto û siba go bêro.

Telefon girewt. Çimê ci bî pirê û zerrîya ci bî tenge. Bermayiş qirikê ci de bî girêk.

Bî siba, gere berê verê sawcî la roja yewşeme yo û sawcî encax nîmeroje yeno. Saete dewrê diyesî berd verê sawcî. Dimayê saetêk bîne sawcî ame. Ewca mesela zelal bî: Dew de erdê ci bibî. Dewijan erdan de esrar ramit bî, eskerî zî ameybî esrar qefelna bî. Ewca çi erdî bibî nameyê wayîrê heme erdan nuştibî û nameyê ê zî nuşt bî û qe hayeyê ci te ra çinî bî.

Destpakerdişê serra 1990'î de dewa Licey ra bar kerd bî. Ê serran de wexto zor ro dewayê înan amebî kerdiş ê zî zêy zehf dewijan bar kerd bî, dew bibî veng. Dima ra henî dewijî ageyray bî a, la o nêageyra bî a û enî bajarê pîlî de bi ca bîbî, torinê ci zî etiya de amebî dinya. Tam bibî 31 serre ke qe nêşibî dew û enka erdê dewe sero bibî bela. Û ene joy ser şewey xo qereqolê serde de derbas kerd bî. Wexto ke sawcî ra va "Tam bî 31 serrî yo ez nêşîya dewe û çi bîyo, çi nêbîyo ez nêzana" sawcî qanih bî.

Wexto berê qereqolî ra kewt teber hetêk ra kêfê ci amebî ke amebî veredayiş, heto bîn ra xemgîn bî ke polîsê şanî heşê ci berdebî, heto bîn ra zî hêrsbîyaye bî û xo bi xo vatêne: "Ene çi qedera ke erdê ma bi ti awayî ma ra fek vera nêdano..." Û dima ra wexto ke pê hesîya, "Goreyê qanûnî ra gere qeybî îfadeyan jo şewêk qereqol de nêmano, îfade bibo zî serê sibayî eşkeno şêro îfade bido", tewr zehf qehir bî, nêzana vajo çi. Bi ofînî qutî titûnê xo vete, cixarayê xo pêça...




# Tiştanok (mamik)



**1-** Tiştek min heye
Du lingo
Li binya tingo
Gelo ew çi ye?

**2-** Tiştek min heye
Mamê mino
Du pencereyên bê derî
Bi şev girtî bi roj vekirî
Kî dizane ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**
**1- Dîk 2- Çav**

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin.
De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya hertim bipirsin.


→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bibêje:
**Lepek qîl li konê me**
**Kenê me tev li qîla xwe**

→ Heke nikaribî wê bibêjî ka vê biceribîne:
**Kûjiya têra ca min sor e**

***Çavkanî: Zûgotinok***
***Berhevkar: Mihemedê Kurdo***



# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. War, wargeh, warê koçeran 3. Yekeyeke giraniyê
5. Xeml û xêza bûkan, mêzera ku davêjin ser serê bûk û zava
6. Paytexta Îtalyayê 7. Cemidî 9. Yek ji milyaketên xweda
12. Bajarekî bakurê Kurdistanê 14. Tûj
15. Dad 17. Cînavkeke pir hejmar di rewşa tewandî de
18. Rojeke hefteyê 22. Kesên ji Şemrexê

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Ziman
2. Tiştanok
3. Kesê hewcedariya wan bi avê heye
4. Bersiva neyênî
5. Rewş
7. Sermiyan, mal û milk
8. Rewan
10. Roja em tê de ne
11. Hilberîna tiştekî nedîtî
13. Silh, lihevhatin
14. Çiyayek li Semsûrê, navê padîşahê ku birca Babilê ava kir
16. Cihê hewandina sewalan
19. Ne biyanî, ne xerîb
20. Alaveke muzîkê
21. Notayeke muzîkê
23. Cînavkeke xwerû

Bersiva hefteya borî






Kewê Redkan

# Destgirtiya bira

Xweziya min bi wan çaxan, çiqas rojên xweş bûn. Ez hê jî li pey wan rojan digerim di nava jiyana xwe de. Di nav malên cînarên me de tenê em du heb qîz diçûn dibistanê, navê me her duyan jî yek bû, ew ji eşîreke din bû, ez jî eşîreke din. Xwarin û vexwarinên me hertim bi hev re bûn, ew ji min bilindtir û bedewtir bû, wê ji min û hemû qîzên li der û doran baştir û çêtir xwe dixemiland û haya wê ji xemilandina herî baş hebû.

Dilketiyên wê jî hebûn, hema ez bêjim hevala min yeke dilse (dil kûçik) bû, hezkiriyên wê dor nedidan hevûdu. Carinan tirs diket dilê min ku hinek pê bihesin, ewqas hezkiriyên wê hene ew ê pir biêşe, ya din jî min nedixwest birayê wê pê bihese. Ew kurikekî wiha ye, serî û çavan nizane, hema li xwişka xwe dide. Hezkiriyeke birayê wê hebû, wana her şev hevûdu didîtin û ji hev hez dikirin, dema dihat malê jî ne dihişt xwişka wî derkeve ber derî, ger tirsa bavê wî ne li ser wî bûya, di wê malê de kesek nikarîbû derkeve derve jî. Hevala min jî yeke bêtirs bû, him bi gotina birayê xwe dikir û him jî ya xwe bi dizî dikir.

Rojekê dîsa em her du çûne ser kaniyê, di nava kêf û henekan de, haya me ji rewşa jiyanê tune bû, em rojane dijiyan ji ber ku em ciwan bûn. Li ser wê kaniyê em çiqasî derengî bimana ji bo me ewqas xweş bû. Wê demê me hemûyan dilketiyên xwe ji dûr ve be jî didît. Destgirtiya birayê hevala min kaxizek da wê û got bide birayê xwe, birayê wê jî ji dûr ve dît ku destgirtiya wî kaxizek da xwişka wî. Piştî demekê em vegeriyan malên xwe, di heman demê de dengê qîrewîrekê hat, em derketin ber deriyan, me dît ku birayê hevala min destê xwe kiriye nava porê wê, bi erdê re dikişîne û bi pehînan lingê xwe jî li her derên wê dixe.

Em ber bi hewara hevala min ve çûn. Birayê hevala min ji xwişka xwe re dibêje: 'Wê çima kaxiz daye te? Tu û birayê wê dilketiyên hev in gelo?'. Hema bi ser keçikê de diqîre û lê dide. Diya min li ber xwe neda, li der û doran darek girt destê xwe û çend caran lê da, kurikî keçik berda, li kêleka malê rûnişt, wisa mîna ew gayên harbûyî, çav lê sor bûne, dûman di difinê wî re derdikeve.

Ez çûm li cem rûniştim, min jê re got, ew kaxiz destgirtiya te ji bo te şand, te nehîşt xwişka te bersiva xwe bide, tu li pey hemû keçikên derve digerî, tu hew zanî xwişka te jî wisa ye, lê tu li ber çavê min û me hemûyan reş bûyî.

Em careke din di ber derê we re gava xwe navêjin. Piştî çend rojan hat gazî min kir ku bi hin gotinan, lêborîna xwe bixwaze, ez derneketim pêşberî wî. Di navberê de demek direj derbas bû, hat ji dayika min re got: "Min gûyekî mezin xwar, min şaşitî kir, ez cahil bûm, filan û bêvan."

Piştî çend mehan ew û destgirtiya xwe zewicîn, xwest ez û xwişka wî bibin serdawetî. Me daweteke pir xweş çêkir, ji ber poşmaniya wî me jî dilê wî xweş kir."

# Her wêneyek dibe qêrîn û hewar

Medya Bal

**Wênexêz Ribwar Parwîzî yê ku wêneyên xwe li ser rojeva kurdan çêdike û di medyaya dijîtal de parve dike, diyar kir ku ew dixwaze qêrîn û hewara gelê xwe bi wêneyan bîne ziman**



Bi pêşketina teknolojiye re êdî bûyerên ku çêdibin bi rengên cudatir û leztir belav dibin. Carina nûçeyeke ku bi rûpelekê tê ragihandin bi wêneyekî jî tê aşkerakirin. Wêneyên Ribwar Parwîzî jî li ser vê tarzê ne ku nûçeyan bi wêneyan radigihîne.

Ribwar Parwîzî di sala 1984'an de li gundê Elekê yê bajarê Kamyaran ê rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye. Parwîzî ji ber zextên rejîma Îranê neçar ma derkeve derveyî welat. Niha li Holandayê dijî.

Têkildarî çêkirina wêneyan Parwîzî diyar kir ku hemû bûyerên li Kurdistanê dibin mijara berhemên wî.

**Ji tunebûnê hebûnê diafirîne**

Ribwar Parwîzî diyar kir ku dema ew zarok bû li dibistanê heftê saetek dersa hunerê didît û gelekî ji vê dersê hez dikir û wiha got: "Lê ji ber tunebûna derfetan min nikaribû xwe pêş bixista. Hem ji ber li gund dimam, hem jî ji ber rewşa aborî min derfet nedidît ku herim bajarên mezin û perwerdeyê bibînim. Di nav vê bêderfetîbûnê de min xwe ji bo fêrbûna wênexêziyê perwerde kir. Min bi reng û qeleman wêne çêdikir. Lê ev saleke ku ez berhemên xwe bi awayekî dijîtal çêdikim û li ser medyaya dijîtal parve dikim. Di heman demê de bi reng û qeleman jî didomînim. Û gelek projeyên min ên cudatir jî hene."

**Ji civakê qut nabe**

Parwîzî ji bo wêneyên xwe yên li ser medyaya dijîtal parve dike jî rawestiya û wiha lê zêde kir: "Mijarên berhemên min girêdayî rojevê ne. Ez berhemên xwe zêdetir li ser mijarên kurdan ên di rojevê de ne çêdikim. Bi nêrînên xwe li bûyeran dinêrim û li gor wê bûyeran bi wêneyan pêşkeşî şopînerê xwe dikim. Di berhemên xwe de ji civaka xwe jî qet qut nabim. Ev jî ji bo min pir girîng e."

**'Dixwazim bibim dengê gelê xwe'**

Parwîzî herî dawî destnîşan kir ku ew dixwaze bi wêneyên xwe hişmendiyekê bide avakirin û wiha got: "Dixwazim bi wêneyên xwe bibim dengê gelan. Bi taybetî jî dixwazim bibim dengê gelê xwe. Bi vî awayî qîr dikim, hawar dikim. Da ku dinya dengê gelê min bibîhîse. Da ku xwe wekî niha kerr û kor nekin. Di heman demê de dixwazim bi berhemên xwe hişyariyekê li ser şerê taybet ê ku li dijî çand, ziman, av û axa gelê kurd tê maşandin bidim avakirin. Bi vê armancê hemû bûyerên li Kurdistanê dibin mijarên berhemên min."

# Tor û suryan û şeraba suryanan

Zîzê

Mêrdîn bajarê qedîm şarê şaristaniyê, bi mîmarî û dîroka xwe, bi çanda xwe ya dewlemend, bi civandin û hebandina bawerî û zimanê cuda navdar û xwedî nirx e. Bajar li ser çiyayî ji jor ber bi jêr ve belav bûye. Bi cih bûye. Biniya wê berriya Mêrdînê ya berfireh, li hêlekê xan û xaniyên ji kevirê spî, qesr û qonaxên neqişandî, dêr û mizgeftên li heman taxê, kolanên teng û otantîk...

Dema mirov ji biniya bajêr li ser xwe dinêre, mîna nîgarekî ji destê wênesazekî/e herî serkeftî derketibe, bedew û çavhebîn, ew qas jî mexrûr û serbilind xwe nîşan dide, lê dema te ji biniya xwe re lê nêrî hingê deştek bi kirasê demsalê ji te re dibişire...

Ji navçeyên Mêrdînê Midyad jî bajarek emsalê Mêrdînê ye, bi avahiyên dîrokî, kolan, qesr û qonaxan ve, her wiha ziman û civaka nav xwe de dihewîne, ji navçeyên din cuda ye.

Bi bax û bostanên xwe, bi zîvkerî û kevirên xwe, bi civaka xwe ya rengîn Midyad navenda Torê ye.

Di nav vê civaka rengîn de xelkê suryan yê qedîm ku pênc hezar sal in xwedîtî li wê axê kiriye, gelek ferman dîtiye. Gelek êş kişandine...Lê dîsa jî bi berhemên xwe bi sineta xwe mohra xwe li herêmê xistine.

Kurmanc, êzidî, suryan, ereb (mihelmî ) bi salan e bi hev re jiyane û dijîn. Cîrantî û hevaltî kirine, tesîr ji çanda hev girtine, zimanê hev hîn bûne.

Her çi qas hejmara êzidî û suryanan kêm mabe jî (bi piranî koçî Ewropayê kirine) li pey xwe şopeke biesas hiştine.

Hejmara suryaniyên li vir mane, ji ya êzidiyan bêhtir e, loma şopa wan winda nebûye. Sineta ji destên hostayê suryan derketî kêm be jî hê berdewam dike.

Bi rastî jî gelê suryan xwedî nirx e û di her warî de jêhatî ye.

Her karê ku dest avêtinê bi hostayî bi zanebûn kirine. Kevir di destê xwe de veguhertine nîgarekî neqişandî. Têlên zîv ta bi ta hûnandine, bi navê têlkarî carina bûye kulîlk, an pel, yan jî teyrê tawûs...

Heger di pêşketina miletan de huner esasek be suryanan ev esas pir serkeftî pêk anîne.

Hinek civakên ne dengnekirî, di huner û berhemên xwe de hebûna xwe nîşan didin, dengê xwe bilind dikin! Civaka suryanan jî yek ji van civakan e.

De ka em werin ser meziyeteke din ya vî gelî.

Hûn jî dizanin di çanda kurdan de her tiştê malê bi qîmet e, ma ne bêminet e!

Êê madem ji destê me tê, em çima şeraba xwe jî ji malê çênekin?

Şeraba malê!

Bawer im, we jî navdariya vê şerabê bihîstiye ne 'şeraba Midyadê ' 'şeraba suryanan'?

Teqez, bûye behs, ber guhê we ketiye!

Heger rêya we bi Midyadê ketibe, yan pê bikeve, hûn ê bibînin, wextê ji sûkê ber bi taxa filehan ve (bi gotina xelkê wir) biçin di rêza dikanê zêrker û zîvkeran de, hûn ê lê rast werin, di vîtrîna dikanan de, şerab jî mîna zêr û zîvan, bi awayekî dekoratîf bi xeml û rewşeke estetîk dê pêşwaziyê ji we re bike.

Bi navê weke Dara, Turabdîn, Ninve Manastir, Verdo û hwd. edilîne. Bi qasî van navên otantîk ku ji derdorê girtine, tehm û çêkirin jî xwemalî ye.

Pêşî her çiqas ji bo xwe û nasan, dost û hevalan hatibe çêkirin jî di demên dawî de bazareke berbiçav a şerabê derketiye holê. Li ser malperên civakî belav dibe, li rêya kargoyê dişînin hemû deveran.

Şeraba ji rezê Midyadê û gundê derdorê, tiriyê bi tavê digihe û şîrîn dibe. Tehma şîraniya xwe ji tavê, xweşiya xwe ji axê digire.

Bi piranî ji du cûreyên tiriyê şerab tê çêkirin. Tirîyê mezrone û tiriyê kerkûş. Cûrêyê mezrone ji bo dims, bastêq û beniyê gûzan tê bijartin. Dikin dims û benî. Ji ber têrav e û zêde ne şêrîn e, xwarina wî hênik e.

Her wiha tiriyê kerkûş jî cûreyekî ji bo mewijan e, çermê wê hinek qalind e û zêde av tê de nîne, tehmeke dijwar dide loma ji bo şerabê tiriyê herî baş e.

Mezrone û kerkûş ev her du celeb carna bihev re, yan jî ji hev cihê tên meyandin. Bi tiriyê reş şeraba sor, bi yê spî jî ya spî derdikeve holê. Bi awayekî xwerû, sade, bê lêzêdekirin dimeyê.

Pêşî di mêwê de heta payîzê bi tîrêjên tavê baş digihe, piştî qurafê tiriyên raxistî jî divê çend rojan bi tavê re dîdariyê bikin, ji bo meya xwe bi tavê re bigire. Heger ranexin û seranser biesirînin hingî bi avîtî çend roja divê tavê bibîne.

Heta baş zelilî û hate parzinandin, digihe qonaxa xwe ya dawî. Êdî di hundir de li hêviya baş meyandinê tê sekinandin.

Li gor cureyê tirî û şêweya çêkirinê şeraba kevnesalî û yên din ji hev cihê dibin. Du sê heyv bendemayîn têrê dike ku bibe malê vexwarinê. Yan jî di civata dost û hevalan de, carina li ser qesr û qonaxê herêmê, li ber tava heyvê di bin stêrkan de... An jî bi bayê payîzê re dibe mestî û kêfxweşî.

Ev mestî û kêfxweşiya jê tê girtin digihije demên dûr û dirêj. Dîroka şerabê bi qasî ya mirovahiyê kevn e. Tê gotin ku di sala 2012 de ji hêla pisporê vî karî ve, şerabxaneya herî kevnar li şikefta bi navê Arenî li Ermenistanê hatiye dîtin û bi texmînî 6 hezar sal berê bi cih bûye.

Li ser warê wê yê pêşî, ji ku derketiye, kê pêşî keşif kiriye gelek nîqaş hene. Lê tişta em dizanin mirovahiyê ji berê de qedr û qîmeteke mezin daye vê vexwarinê. Ji hêla hin miletan ve weke teberik hatiye dîtin.

Li gor baweriya xiristiyanan hezretî Îsa di xwarina xwe ya dawî de nan û şerab daye hawariyên xwe û gotiye: 'Nan bedena min e, şerab jî xwîna min e' Loma di ayinê de rîtûelek nan û şerabê heye.

Her wiha di mîtolojiyê de, di wêjeyê de, li ser figûr û resmên kevnar sifre û şerbik, piyaleyên şerabê tên neqişandin.

Helbestvan ji meyger hey şarabê dixwaze, li baxê cinetê ji çem û robaran diherike (Dibe ku sembolîk be yan jî rastî be, lê bi nav şerab e)

Geh dibe lêva yarê, geh dişibe xwîna sor, geh dibe mestî û serxweşî ji destê meyger, an jî aşiq bi mey û xeyala yara bêwefa bêhiş dibe...

Mîna Xeyam jî dibêje û dibilîne;

*"Vexwarina şerabê û şabûnî ayîna min e*

*Destkişandina ji kufr û dîn dînê min e*

*Min ji bûka dinê re got-qelenê te çi ye*

*Go: Dilê te yê şa qelenê min e"*

Dema gotin tê ser Mêrdînê û Midyadê deng û reng peyv û bêje pir dibin. Yek li ya din zêde dibe. Ji kîjan teybetmendiyê dest pê bike, ya din kêm dimîne. Vê carê gotinê xwe li meyê girt dibe ku careke din berê xwe bide qonaxek din!

Li Mezopotamya ku şaristanî jê niziliye xelkekî hêja; bi hebûna xwe bi nirxê xwe bi qasî vê axa qedîm, şax vedaye û mohra xwe li cihê lê çêbûne û niha lê ne xistiye.

Loma jî hêjayî behskirinê û pesindayinê ye, peyv ji ber xwe ve dibe pesin...

Gotineke kurdan heye, dibêjin "Xebatkarê xwe yo, şîrînê ber dilê xelkê yo"

Her kes dibe şahidê kar û xebatên xelkê suryan, bi heyranî  lê sêr dikin.



xwebûn

4-10 Cotmeh 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 94

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazışleri Müdürü:** Elif Can Alkan
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85


Kevirê hesteyan (Sîleks)


Lapis Lazûlî


Yaqûtê Mor


Malakît



Kevirê Şebê


Perîdot-Olîvîn-Zebercet



Çavê Piling


Onîks


Mircan


Opal


Pîroze (Firûze)


Pîrît


Kevirê Heqîqê



Yaqûtê Şîn


Kevirê Şoqil (Kevirê Hîvê)


Sitrîn


Azûrît


Obsîdyen


Jasper


Yaqûtê Binevşî


Kalsedon


Kevirê Stresê


Kevirê Kareba


Zîrkon (Kevirê sor)

# Kevir û Ziber

Elo Dîno

Dîroka zêr û ziber ango kevirên xilxalan heta 7 hezar salan di nava dîrokê de şax berdide. Di vekolînên şûnwarnasiyê de li ser laşê mirovan zîv, zêr û zibêrê xemlê ku aydî 7 hezar sal berê ne ji gorên miriyan hatine derxistin. Bi taybetî li ser xaka Mezopotamya û Anatoliyaya Navîn di gorên zarokan de kevir, zêr û ziberên nexşê li ser termê miriyan hatine dîtin.

Di demên Beriya Zayinê (B.Z.) de bi taybetî mircan û ziberên rex çem û golan, derdorên peravên deryayan dihatin komkirin û wekî xeml û xweşikbûnê dihatin bikaranîn. Li aliyekî ji bo bala çavan bikişînin ser xwe, li aliyê din li gorî bîr û baweriyan û li gorî fîzyolojiyê wekî amûrên hêz, aramî, zanebûn û dermanê gelek nexweşiyan dihat bikaranîn.

Dîsa li gorî hin rîwayetan tê gotin ku mirovên Beriya Zayinê ji bo ku mirî karibin li cîhana din ezabê xerab nebînin û bi awayekî bihêz derkevin pêşberî Xwedayên xwe ev zîwer û bi miriyan ve dihatin kirin. Wekî xelata hêz, bedewî û wêrekiyê bi kesên mirî ve dihatin kirin. Piştî hesin, zîv, zêr û haqil hatin dîtin êdî bêtir ji bo bedewbûnê li şûna ziberan zîv û zêr hatin bikaranîn. Bi pêşketina bazirganiyê re ev amûrên xweşikbûnê bûn çavkaniya pîşeyên nû û hunerên destan û hunera xilxalê bi neqişandina wan dest pê kir. Çend kevirên giranbuha û xwedî hêz wiha ne:

**Kevirê hesteyan (Sîleks)**

Di cîhanê de kevirê herî hişk û qesm e. Jêre arpeşk jî tê gotin. Dema pola an jî hesin lê dikeve çirûskên agir ji ber dipeke. Di Beriya Zayinê de wekî amûrê pêxistina agir dihat bikaranîn. Di serdema B.Z'ê de di çêkirina gelek amûran de wekî madeyê xam dihat bikaranîn. Her wiha dîsa mîna amûrê birîn û tûjkirinê dihat bikaranîn. Ev kevir cûreyekî kuvarsê ye. Bi latînî navê wî "sileks". Ji ber pir kêm tê dîtin demekê pir biha bû û di bazirganiyê de girîng bû. Di dema ku çekên biagir nû derketin de, ji bo arpêketina barûdê ev kevir dihat bikaranîn. Îro di hesteyan de tê bikaranîn.

**Yaqûtê Mor**

Kevirê evînê ye. Enerjiya di laş de komî ser hev dike û hêza mejî zêde dike. Enerjiya neyînî vedigerîne enerjiya erênî. Ji bo depresyonê bi sûd e. Ji aliyê şifayê ve kevirê herî bihêz e. Ji nexweşiyên wekî alerjî, mîgrenê, nexweşiya dil û gelek nexweşiyên din re baş e. Dil û mejî diparêze û bi hêz dike.

**Kevirê Şebê**

Hevsengiya hestan e. Fonksîyonên mejî hişyar dike. Enerjiya neyînî ji derdora kesan belav dike û enerjiya erênî kom dike. Çalak dike, lêhûrbûnê zêde dike û bi hêz dike. Wekî kevirê xewnê jî tê zanîn. Li dijî bêhêvîtiyê, xemsariyê û huznê mirovan bi hêz dike.

**Çavê Piling**

Kevirê xet xetî ye. Hevsengiya enerjiyê pêk tîne. Di jiyana bazirganiyê de şensê zêde dike. Dibe alîkariya serdestiya tirs, hesûdî, nefretê. Ji bo nexweşiyên bapêş û zekemê baş e. Ji bo pergala herifandin, zirav, mîde û dil baş e. Êşa serî sivik dike û xewê tîne.

**Mircan**

Ji dil û kezebê re baş e. Dil li hemberî gelek nexweşiyan diparêze. Ji nezera çavan diparêze. Çerm jî ji gelek nexweşiyan diparêze û ji bo dermankirina çerm bi xwe ve dikin.

**Pîroze (Firûze)**

Ev kevir herî zêde bi dergûşên zarokan ve tê kirin. Bi wesayît, avahî û amûrên giranbiha ve dikin. Zarokan û alavan li dijî nezera çavan diparêze. Tîrêjên çavan yên qansêrê çedikin diparêze. Remza ragihandin, aramî dostanî û şefqatê ye. Li dijî nezerê bi hêz e. Hestiyan zexm dike û li dijî nexweşiyan diparêze. Destûr nade ku hestî bihelin. Mîgrenê kêm dike. Kuxukê radiwestîne. Pergala tevgera xwîn, kezeb û bêhnê xurt dike. Mêzîna tansiyonê diparêze.

**Kevirê Heqîqê**

Stresê dikuje. Hêz û enerjiyê dide mirovan. Hêza mejî û aqil zêde dike. Mirovan ji nezera çavan diparêze. Ji bo tendirustiya jinên ducanî û zarokên wan bi sûd e. Mêzîna tansiyonê diparêze.

**Kevirê Şoqil (Kevirê Hîvê)**

Wekî mertal mirovan li dijî enerjiya talûkeyê diparêze. Jiyanê bi mirovan dide hezkirin û coşa mirovan zêde dike. Dibe sedema bibîranîna xewnan. Pirsgirêka gurçikê ji holê radike. Mirov xwe tim têr dihesibîne.

**Azûrît**

Herikbariya pergala rehikan zêde dike. Tevgera mirov bi lez û bez dike. Oksîjenê hîn baştir û sûdewer dike. Hiş û mejiyê mirovan zelal dike. Her tim mirovan zindî dihêle û hişyar dike. Destûr nade ku çav û mejî biweste.

**Jasper**

Pişik, kezeb û dil bi hêz dike. Li hemberî nexweşî û qirêjiyê parastineke xurt dike. Hêza xwe ji axê digire û remza elementa axê temsîl dike. Dîsa pergala herifandinê û tûrikê zirav zexm dike. Pergala hevsengiya hormonê hundir (endokrin) diparêze. Hêza fîzîkî zêde dike û bixwebaweriya mirov xurt dike.

**Kalsedon**

Mêzîna fîzîk, mejî, hest û ruhê mirovan e. Merdî, dilzîz, nişmî û famkirinê zêde dike.

**Kevirê Kareba**

Wekî kevir tê zanîn. Lê belê reçîne û benîştê hişk e. Pir nerm û sivik e. Dema mirov gez dike, ceyran û miqnatîs derdikeve holê. Germê belav dike û nexweşiyan dikuje. Mirovan ji sermayê diparêze. Ji ber van taybetiyên xwe mirov bêtir dixin stuyên xwe. Ji bo dermankirina nexweşiya Guatirê bi xwe ve girê didin.

**Lapis Lazûlî**

Depresyonê ji holê radike. Hestiyên mirovan zexm dike. Mêzîn û hevsengiya tansîyonê diparêze. Nexweşiyên bi riya bêhnê derbasî laşê mirov dibe dikuje. Ji bo kesên nabihîzine, xwarinê naferikînin û nikarin baş bêhn bide û bistîne derman e.. Dermanê razanê ye jî.

**Malakît**

Hêrsbûn û acizbûnê ji holê radike û belav dike. Êşa diranan û romatîzmayê dişkîne. Bêhna mirovan fireh dike û damaran nerm dike.

**Perîdot-Olîvîn-Zebercet**

Hevsengiya mejî û laş diparêze. Aramî û xweşbîniyê dide mirovan. Tirs û xofê kêm dike. Hesûdî û qehrê belav dike. Kêfxweşî û hezkirinê zêde dike.

**Onîks**

Fikaran kêm dike. Hevsengiya jin û zilaman tîne astekê. Têkiliya jin û mêran xurt dike. Li dijî nezerê derman e.

**Opal**

Hestên neyînî dimije û tune dike. Hevsengiya hestiyarî diparêze. Hestên dîtinê xurt dike û pêhesiya mirovan xurt dike. Mirovan hişyar û zindî dike.

**Pîrît**

Kevirekî ku li ser deq û nîşaneyên zêr hene. Zêde diçirûse û pir xweşik e. Birqonek e. Ji bo kesê bêhnteng û bêhezm baş e. Ji bo herikandina xwîna laş baş e. Fonksiyonên mejî zêde dike. Ahengsaziya xebatê zêde dike.

**Yaqûtê Şîn**

Dil û gurçikan bi hêz dike. Hemû dohnê avzê dixe nava tevgerê. Hêza pêşbînî û hizirandinê xurt dike. Mirovan bêhtir afirîner dike. Mirov tîne ser hişê xwe û li dijî jibîrkirinê derman e.

**Sitrîn**

Kevirê serkeftinê ye. Enerjiya neyînî belav dike. Pergala parastina laş bi hêz dike. Di aliyê antîoksîdenê de bi hêz e. Çavan li hemberî nexweşiyan diparêze.

**Obsîdyen**

Ji bo ceyrana laş vala bike kevirekî gelek baş e. Hestên acizbûnê û kerbê vala dike. Ji bo paqijkirina fatereşkê gelek bi fêde ye.

**Yaqûtê Binevşî**

Hemû enerjiyên neyînî ji laş dûr dixe. Deriyê dil li evîna gerdûnî û hezkirinê vedike. Şerê di navbera hevseran de bi dawî dike. Jixwebaweriyê zêde dike. Pergala parastina laş xurt dike. Herikandina xwînê lez û zexm dike. Germa laş kêm dike û hevsengiya tansiyonê diparêze.

**Kevirê Stresê**

Ji sêhr û efsûnê diparêze. Enerjiya neyînî ji laş dûr dixe. Mirovan ji stresê diparêze. Dibe sedema xewnên baş. Ji bo êşa diran û laş baş e. Ji bo çavan jî gelek baş e.

**Zîrkon (Kevirê sor)**

Kevirê zîrkon ji bo livbaziya roviyên zirav û stûr baş e. Dihêle ku mirov xweş û rihet razê. Her wiha hevsengiya hestan jî diparêze.